



îşen me

okî dînîfîsi

Samî Berbang:

Serokê polîsan û bikuj
di milê hev de

Rûpel 3

A. Melik Fırat:

Her kesek li gorî
şîrê xwe!..

Rûpel 4

Hevpeyvîn ligel M. Can Toprak

Cihê me li ba ked,
demokrasî û azadiyê ye

Rûpel 16

NAVEROK



Metin Aksoy: Kapitalizm, nijadperestî û sînema

6



Ezras Maya: Konferansa dîroknişîsına kurdî

7



Helim Yûsif: Li Başûrê Biçûk Mihrecana helbesta kurdî

11

Ji Xwendevanan

PAS silaw û rîzîkî bê payan xwazîyari ew perî serfirazî û serkewtintan in le karekan- tan û be germî destî mandubuntan degusîn. Her çende debûyaye ême zâtir be dîdarî em rojnamey şad bibayn, belam be daxewe ême le basûrî Kurdistan derfîsi eweman bo nederekxa agadarî karibarekanî rojnamegeryêtî kurdi êwe bîn û le nizikewe peywendimân legel êwe hebê. Be herhal ewa êsta bo yekemîn car em rojnamey berdest kewt. Zorbey şadûman im, çunke bo min weku ewe waye taze dêrcübê... Boye le naxewe pirozbayekî gerimtan araste do-kem û hîwadar im em rojnameye le karwanî roşnîbirî xoy diwa nekewê, le dêrcûn berdewam bê û hêdi hêdi bêrew pêşeweqün da bê.

DARA EHMED

BERIYA dest bi nivisa xwe bikim, ez dixwazim silavên germ û gîrîn ji we re bişînim. Çima silavên germ û gîrîn, ji ber ku ez hê teze ji Amedê, ji welat hatime, silav silavîn welat in. Gava ez ji Amedê hatim, min digot, ezê li Stenbolê ci bikim; dûrî welat li xerîbiyê.

Lê gava min Azadiya Welat dixwend bêhna welat, bêhna Amedê jê dihat. Bi sa- ya Azadiya Welat bêhna min derket. Iro li hemberî tevgera azadiyê neyarê hov dest avetiye şerekî qirêjî. Wekî mirîka ser-jekirî dipirpirte, nizane ci bike. Eriş kir ser girtiyen Girigîha Amedê, ew çelengen bê- çek kuştin. Çend mirovîn stembar kuştin avetin ser riyan. Edî ew nizane ci bike.

BADIN POLAT



Rim di têrê de êdî hilnayê

MEHMET GEMSİZ

Serê salekê ye raya giştî, gotina "çete" û "çeteyen bi uniforma" pir dîbihîze. Van çeteyan, tiştî ku nekirine û na- kin, nîn e. Ji bazırganiya esrar û eroînê he- ta bi kuştina mirovan, ji revandina miro- van heta bi qaçaxiya çek û sîlehan. Hema em ci bixwazin, heta tiştîn ku nayen hi- şen me jî, kirine.

Sedema ku ji wan re tê gotin 'çeteyen bi uniforma' jî ev e. Di nav endamên wan de rayedarê asta bilind ên teşkilata emni- yetê û leşkeriyê jî hene. Ji komiser û polîs û tîmîn taybet bigirin heta bi zabitên (su- bayen) leşkerî.

Li ser van çeteyan, hikûmetê, daxuya- niyên eletewş didan raya giştî. Bi taybetî Wezîrê Karê Hundîrin Mehmet Ağar li ser ekerebûna wan çeteyan û kirinên wan ên çepel û gemâr tim gotinên "Ev hediseye- ke munferit e" û "Di nava cemiyeta emni- yetê de tiştîkî normal e ku çend kesen xe- rab û nepak derkevin" tekrar dikirin. Bi wan jî nedîma û "Divê emî kîfa polîs û leşkeren xwe neşkînin, ji bir nekin ew li hemberî terorê tê dikoşin", digot.

Belê, di riya welat de her tişt mubah û halâ e...!

Em bi bir bînin ku, navê wî şefê polî-

san ê berê bi van "bûyer" an re dihate te- lafûzkarin. Tê idiakirin ku Ağar rîxistîneke veşarı ava kiriye û bi wan "karên dewletê yên nelirê" dide kirin, wekî infazîn bê- mehkeme, kuştina Behçet Cantûrk, Savaş Buldan û hwd.

Nemaze, Faysal Söylemez ê ku tevi çend polîs, zabit û komîseran wekî "Çete- ya Söylemez" hatin binavkirin, diyar di- kir ku tîkiliya Ağar bi çeteyan re heye û ew jî di nav karên çepel û tarî de ye û gir- tina wan jî komployeke wî û ya Mala Bu- cakan e.

Bûyera dawî, qezaya li Susurluka Balî- kesirê, ku tê de Abdullah Çatlı, mudire polîsan Hüseyin Kocadağ û jinikek bi na- vê Gonca Us miribûn û parlementerî DYP'ê û serokê ceşan Sedat Bucak jî bi- rîndar bûbû, kir ku careke din bala raya giştî here ser çeteyan.

Hemen hemen hemû çete, ne bi lêge- rîn, lêpirsin û xebata dozger û polîsan der- ketibûn holê. Jixwe, pişî ku bi feleqreşî ew ekere dibûn jî, çendek bi şûn de ew dihatine jibîrkirin, heta dihatine bindo- sek-kirin.

Çeteya dawî jî bi saya "qezayê" ekere- bû. Bihevrebûna her sê kesan, kir ku care-

ke din raya giştî dêhî û bala xwe bide ser Mehmet Ağar. Ağar wekî her gav dîsa hel- westa xwe ya berê domand û bûyer mîna rasthatineke jirêzê bi nav kir. Paşê jî xwe ker kir, deng jê derneket.

Li gel helwesta Ağar, gotin ku beriya qezayê li Kuşadasîyê bi vê çeteyê re bûye û tîkiliya wî bi wan re heye.

Beriya bûyerê Serokê Partiya Karkeran (IP) Doğu Perinçek raporeke MİT'ê eşkere kiribû. Perinçek digot diya çeteyan Çiller û bavê wan jî Ağar e.

Lê Çillerê jî pê kiriye ser Ağar ku istîfa bike.

Warê tevgera van çeteyan ne ev cog- rafya bi tenê ye. Ewrûpa, Asya jî ji ber wan nafilite. Dedektîfî pispor ê İnterpolê P. Bursehauer dibêje ku şebekeya ticareta eroînê ji tirkêna rastgir û nijadperest pêk tê. Her wiha giliyên Tirkîyeyê dikirin ku es- rar, eroîn û kokaîn ku li Ewrûpayê tê firo- tin, ji sedî heşteyê ji Stenbolê tê.

Bawerî ew e ku bi wî pereyê-qirejî ji çalakiyên terorî finanse dikin. Yanê glad- iyoya xwe, kontr-gerîlaya xwe wisa swedî dikin.

Tiştîkî balkêş e şirîkê hikûmetê Er- bakان li ser çeteyâ dawî xwe li ker ã laflîtiyê daniye, rola birayê ker û lal dilîze. Her wiha çapemeniya wan jî bêdeng e.

Dewleta kemalî heta qirika xwe di ritam, gemar û pîsiyê de ritimiye. Wisa repisiye ku êdî kîlêne wê hev berdidin. Riziyaye, genî bûye ku pêşîya wê bêhînê nayî girtin. Rim di têran de nayê veşartın.

CHP ci be DBH jî ew e

**Hz. Ali serokê berxwedanê ye û bi gelên bindest re ye
û ji bo vê jî, bi destê kedxwaran, di mizgeftê de hate
qetilkirin. Baş têzanîn, pîrê welêt Seyid Riza jî**

li Meydana Xarpêtê hate darvekirin.

ya heqîqi vala bikin û ruhê berxwedanê bikujin û alewiyan ji xwe re bikin kole. Wan bêreaksiyon bihêlin. Belê, li ser vê daxwaza kedxwaran tîr, alewiyan kurd tu demê serê xwe li ber van politikayê qirêj dananîne Berxwedana Dêrsimê ya Seyid Riza jî, yek ji van serhildanen e. Dîsa, li Kogiriyê, li Mereşê û li Bingolê her ev berxwedan çebûne û heta niha jî, berdewam in. Di van şeran de, bi heza- ran kes hatin kuştin û bi hezaran jî, ji ser- erden xwe hatin koçberkirin.

Lê belê bi kuştin û koçberkirin, ruhê alewîtiya berxwedê nemir û neqedîya. Komara tîr xwest ku bi awayekî din ruhê alewîtiye xelas bike û li ser navê ale- wîtiye, rîxistîna CHP saz kir û perdeya qirêj da ber rûyê xwe û xwe di bin vê perdeye de bi ruhê kemalîzmê vesart. Bi vê politikaya qirêj gelek şexsiyet û "rewşenbîrîn" alewî jî, bi peran kirin û xistin pêşîya alewiyan. Her çiqas, kesen xwenas û zana li pey wan neçûn jî, lê belê piraniya alewiyan bi vî rengî hatin xapandin.

Pîrsa mezin jî ev bû, komara tîr di vî heftê salî de armanci ji xwe re danîbû ku, alewiyan di nava CHP'ê de bîhîline û temamî alewiyan bi xwe ve girê bîde.

Lê, bi tîkoşîneke mezin, hêzên azadi- yêv armanca kemalîzmê tîk birin. Be- lê, dek û dolabê komarê xelas nebûne.


Iro jî bi navê aştiyê tevgeran amade dikin û bendê xeniqandina alewiyan kurd jî dane destê Ali Haydar Veziroğlu. Ger, DBH aştiyê dixwaze, iro bi he- zaran mirov, li Kurdistanê tê qetilkirin û tê işkencekirin. Bi hezaran gund hatin şewitandin û bi hezaran gel koçber bû li kolanê xerîb ketin. Çima dengê xwe na- kin? Çima li şerî qirêj temaşe dikin û li hemberî zilmê dernakevin? Qetîşmân li Mereşê, li Çorûmê, li Erzinganê, li Dêr- simê û li Koçgiriyê bi destê kemalîzmê hatin kirin, ci zû hate jibîrkirin.

DBH'ê di kongreya xwe ya yekemîn de du trîlyon û nîv pere xerc kir. Kana van pereyan kî ye, yekî wekî Veziroğlu dikare kî bixapîne? Her kes dizane ew pereyîn komara tîr in, ji bo helandin û xapandina alewiyan belengaz in. Ewê Veziroğlu çiqas bigihîje armanca xwe, ew xorten ku di kongreyê de dirûşme di- avetiñ, ew dermedixistin derve. Digot "navê me cuda ye lê paşnavê me Tirkîye ye." Şerî azadiyê, di demeke nêzîk de wê rûyê wê yê res jî, derxê holê.



KOMA Mafêni Mirovan a Parlementoya Brîtanyayê roja 5'ê sermawezâ 1996'an ji bo Kanî Yılmaz civînek li dar xist. Parlementerên ku besdarî vê civînê bûn, bi bîr xistin ku ev du sal in Kanî Yılmaz girtiye û berdana wî xwestin.

Her wiha hate gotin ku girtina wî şermek mezin e ji bo demokrasiya Rojava û nemaze jî ji bo ya Brîtanyayê. Parêzerê Kanî Yılmaz Mark Muller jî axatînek kir. Kesên ku besdarî vê civînê bûbûn; Cynog Dafis, John Austin Walker (mebûs), Bruce Kent (mebûs) Serokê Buroya Aştiyê ya Navneteweyî Lord Eric Avebury, Lord Ryman Hyton û nivîskar Sheri Laizer.



Li Girtîgeha Aydinê 85 kes greva birçibûnê ya domdar a ku di 27'ê rezberê de destpêkiribû, didomînin. Li gorî agahiyan rewşa girtiyan gelek xerab e, hinek ji wan rakirine nexweşxaneyê, lê ji ber ku wan tedawî nepeljirandiye, bi sun ve anîne girtîgehê.

Li aliye din roja 6'ê sermawezê 17 kesen din dest bi grevê kir. Her wiha li girtîgehêne weki Amasya, Konya, Burdur, Meletê, Erzerom, Elezîz, Nazilli, Ordu, Trabzon, Zile û Elbistanê jî girtîyên PKK'yî greva birçibûnê ya ku di 27'ê rezberê de dabûn destpêkirin, didomînin. Li girtîgehêne Buca û Bursayê jî girtiyan ji bo piştgiriye dest bi greva birçibûnê kir.

NÛÇE

Serokê polisan û bikuj di milê hev de



Nirxandina Mahmud Kılınç

Tiştîn ku me heta niha digotin, bi vê bûyerê rast derketin. Me digot, di nava dewletê de dewleteke din heye, niha her kes vê yekê dibêje. Hevalen me yên ku niha di hundir de ne jî, ji vê bêhtir tiştîk negotin, lê ew girtin û avêtin hundir. Li cîhana iro domandina şerekî paqî negengaz (mimkûn) e. Ji bo ku dewlet karike şerekî bi vî rengî bidomîne, divê bikeve nava têkiliyên qirêjî.

Li aliye din dewleta tirk li ser dewan ava bûye. Lê êdî dawîya derewan hat, ew nikare bi vî awayî karê xwe bi rî ve bibe. Jixwe dewletê hêvî nedikir ku wê gerfla ew qas bi xurî li ber xwe bide. Bi van çalakiyên ïntixarî jî diyar bû ku çareseriya leşkerî negengaz e. Êdî dewleta tirk jî mecbûr e, çareyeke din bibîne. Dinya jî vê yekê dixwaze. Ez bawer dikim wê Clinton jî di nava du sê mehan de gelşâ kurdi bîne ber dewleta tirk û jê çareseriyeke siyâsî bixwaze. Her çiqas ev çare ne li gorî daxwaza me be jî, wê hin tiştan li Tîriyeyê bike ferz.

Eşîra Bucakan ji berê ve di nava karên pîs de ye, berî PKK'ê jî wisa bûn. Berî salên 1980'yi ji Semsûrê (Adiyaman) li dora 200 heb traktor dizîn û avêtin paş xwe. Dema xwedîyê traktoran ji wan dixwestin, digotin "Erî van traktoran bibînî", paşê heke buhayê traktore 50 milyon bûya, 25 milyon ji wan distandin û traktor didan xwedîyê wan. Ne tenê ew, pez, dewar, ker jî didizîn. Hemû pîsîti li ba wan peyda dibe. Her wiha ci kesê ku karê pîs dikir xwe diavêt paş wan. Wan jî ew ji xwe re dikirin diz û tetik-kêş. Wekî tê zanîn di şerê Cezayîre de jî hinek ereban piştgiriya fransîzan kirin, lê piştî şer ew li serê Fransayê bûn bela, ewê jî li serê komara tirk bibin bela.

Tim dihat gotin ku mafya ne li derveyî dewletê ye, hêzên dewletê, heta bigihe giregirê wê di nava karên kirêt de ne, di nava salekê de bûyerê ku qewimîn, bi taybetî jî bûyera dawîn ev gotin îsbat kir.

Roja 4'ê sermawezê li Susurluka Balikesirê kamyonek û mercedesek li hev qelibin; sê kes mirin, kesek jî birîndar bû. Di vê bûyerê de tiştî gîring ê ku hefteyekê rojava Tîriyeyê dagirt nasnameya kesen ku di mercedesê de bûn; serokcerdevan û mebûsê DYP'ê Sedat Bucak, pisporê terorê -avakarê sisteme tîmîn taybet-serokê polisan Hüseyin Kocadağ, bikuje (qatilê) fasîst, serokê duyemîn ê berê yê Ülkü Ocakları Abdullah Çatlı û hevala wî Gonca Us ku li gorî gotinan ji bo MİT'ê dixebeitî.

Çapemeniya tirk bi berfirehî li ser vê bûyerê rawestiya. Gelek tiştî hatin gotin, ji wan tiştan derxistina portreya giştî ne hêsan e. Têkilî jî Azerbaycanê heta Romayê, Parîsê, Swisreyê dirêj dîbin. Lî dema mirov bala xwe didê ew kes, teví hinekîn din li Kurdistanê digihêjin hev.

Berî vê bûyerê bi hefteyekê rojnameya Aydinlikê raporeke MİT'ê weşand. Roja 5'ê sermawezê Serokê IP'ê Doğu Perinçek li ser bûyerê civîneke çapemeniyê li dar xist. Li gorî Perinçek Wezîrê Karê Hundîn Mehmet Ağar û Tansu Çillerê rîxistîneke nehêni (vaşarı) ku 700 endamên wê hene ava kirine. Wî da zanîn ku endamên vê rîxistîneji nav MİT'ê, mafaya ülküçüyan û tîmîn taybet têni niqandin. Li gorî nirxandina Prof. Mahir Kaynak ku bi xwe jî berê di nav MİT'ê de cih girtiye, hin kes ji borizgarkirina dewletê bi awayekî ilegal ketine rî. Ew balê dikişine ser pereyêni 'kana nehêni' de û dide zanîn ku ne diyar e ka ew pere li ci têne xerckirin.

Malzemeyen ku ji erebeyê derketin jî didin zanîn ku, ew kes digel revandin, işkencelerin û kuştina mirovan, karê şealandin, xûgîstandin jî dikin. Her wiha bi vê yekê jî namînîn, karê eroîn û esrare jî dikin. Di erebeyê de çekîn mezin, çardexurên bi dengkuj (susturucu), hacetên guhdarkirina li telefonan û çentekeyî tiji dolar hatin dîtin.

Tim dihat gotin ku mafya ne li derve-



Bi qezaya ku Abdullah Çatlı, Hüseyin Kocadağ û Sedat Bucak derbas kir, rîxistîna nehêni ya Tansu Çiller û Mehmet Ağar derket holê.

yî dewletê ye, hêzên dewletê, heta bigihe giregirê wê di nava karên kirêt de ne, di nava salekê de bûyerê ku qewimîn, bi taybetî jî bûyera dawîn ev gotin îsbat kir. Li pişt bûyera Engin Civâan malbata Özal derket, li nik Tevfik Ağansoy parêzkarê Tansu Çillerê derketin û li pey hev çeteyen ku ji itürafkar, cerdevan, polîs û leskeran pêk têne, derdikevin rastê. Mirov navênu ku bi vê bûyerê re têkildar li dû hev rîz bike, wêneyê dewletê derdikeve holê:

Abdullah Çatlı, her çiqas li ser kaxîzê lê bê gerîn jî, ji bo dewletê dixebeitî; wî li ser navê dewleta tirk êrisi biriye ser kampê ASALA'yê; bi handana Ayvaz Gökdemir xwestiye li dijî Haydar Aliyev darbeyê li dar bixe. Xort birine Nehçîwanê, hêvotine û anîne li Kurdistane xistine nava şer.

Hüseyin Kocadağ serokê polisan e, li Culemêrg û Amedê gerînendetîya polisan kiriye. Wekî yek ji sazûmankarê tîmîn taybet tê zanîn. Sedat Bucak ji partiya DYP'ê mebûs e. Her wiha ew sero-


kê eşîra Bucakan û li dora Siwêregê komareke kirêt ava kiriye. Li dijî tevgera kurd ji bo dewletê dixebeitî. Gelek mirovên welatparêz bi destê mirovên wî hattine windakirin. Beramberî vî xizmetî, li zeviyen xwe kinf (giyayê esrarê) dide çandin. Tansu Çiller, Ayvaz Gökdemir û Mehmet Ağar jî hewceyî danasînê na-ke.

Wekî ku Mebûsê DEP'ê û Endamê Komîsyona Rêveber ê PKDW'ê Mahmud Kılınç jî dibêje: "Vê bûyerê gotinê ku rewşenbîren kurd bi salan in dibêjin tesdiq kîrin."

Wisa xuya ye ku wê tu encam ji vê bûyerê jî dernekeve. Kesên bi bûyerê re têkildar in li benda keysa xwe ne ku dawiyê li nîqaşê bînin. Her wekî Prof. Mahir Kaynak jî dibêje, "Kesekî ku karibe bi ser vê bûyerê de biçe, tune. Heke dozgerekî wêrek derkeve jî, wê di cih de bi çepîlê wî bigirin û li Meydana Tak-simê wî li erdê bikişîşinîn."

SAMÎ BERBANG

Her kesek li gorî şîrê xwe!..



A. MELİK FIRAT

Berî niha bi demekê Rojnameya Radikalê bi min re hevpeyvînê kir. Beriya ku bêñ, min ji wan re got: "Patronê we tu carî di weşanê xwe de cih nadine me, ya baş ew e, neyên, xwe newestinîn."

Gotin, "Na, emê neşir bikin" û hatin, em peyivîn. Min ji wan daxwaz kir ku pişti gotinê me derbasî nivîsê bikin, bila ji min re faks bikin. Dibe ku hinek tişteñ kêm û zêde hebin, em tashîh bikin. Soz dan, gotin "baş e" lê soza xwe bi cih neanîn. Ji peyivandina min an ji sedî pêncî dan, an na û di hinek deran de kemasî hebûn ku maneyên xelet didan.

Min ji wan re jî telefon kir ku tashîh bikin, gotin "baş e" lê nekirin.

Di hevpeyvînê de, bi tabîra tîrkan gôtineke "devlet benimle işbirliği yapşın" (Bila dewlet bi min re hevkîriye bike) hebû ku ez ji gotina "işbirliği" yê pir xû dikim... Min wer negotibû. Gotina min ev bû:

"Iro ew mirovîn ku Tirkîyeyê idare dikin wer bêmx, bêmejî û bêhiş in ku menfîetê welatê wan, menfîetê gelê wan, li ba wan ne muhîm e. Derdê wan; tenê dagirtina berika wan e... Mesela iro pirs-girêka kurd û Kurdistânê heye, tesîra malbata me ne ku li Tirkîyeyê tenê, li ser kurdêñ temamî parçeyan heye. Di nav kurdan de itibareke Şêx Seid heye. Ku dewlet ji bo aştiyê bi me re bipeyive, wê feyde ji bo welat çêbe."

Yanê min ev tişt gotin, wan ji ev nivîsandin: "Benimle işbirliği yapşınlar."

Ev ne uslûba peyvandin û nivîsandina min e, ez ji cumleya hanê gelekî aciz im.

Li ser pîrsa "Ên ku dewletê idare dikin ji bo feydeya xwe ya şexsi aştiyê naxwazin. PKK jî naxwaze, hûn ci dibêjin?", min ev gotibûn:

"Serokê PKK'ê tim di peyvandinê xwe de eşkere dike ku ew aştiwaz e û Serokê PKK'ê dîsa tim dibêje ku di nav wan de gelek ajanêñ (sixur) MİT'ê hene. Yanê dibe ku ew kesen wisa jî nexwestibin aşti çêbe."

İca ev gotinê min jî mîna "PKK jî MİT e" dane. Ev ne gotina min e, xelet e... Çapemeniya tîrkan jî wiha ye, rojnameyen wan wiha ne.

Hûn xwendevanê hêja baş dizanin...

Ragip Duran jî kitêbeke bi navê "Apoletli Medya" nivîsandiye. (Ew jî nîşan dide ku) tev were ne. Di navbera wan de ferq tune. Ha rast, ha cep, ha orte, ha

Ev mirov ne tiştik e, ez neqaîl im ku wî ji xwe re müxatap bigirim. Wexta ku were ba min, pê re dipeyivim jî, yanê tu kîn û xezeba min jî, ji bo wî tune.

Ev mirovîn bîçük in. Ji bo hestiyekî, ji bo kûtekî, xwe difiroşin... Mirovîn ku sektebîet bin, were ne.

ser û ha bin... Giş yek in, mîna hev in... Tu çer biki bêfeyde ye...

İca li ser wê hevpeyvînê, Altemur Kîlîç ji rojnameya Radikalê re nivîsek şan-dibû, ew tenkîd dikirin ku çîma di salve-gera komarê. (Cumhuriyet) de cih dane yekî mîna min...

Yê ku Altemur Kîlîç ji dûr ve nas di-ke cihê difikire, yê ku wî ji nêzîk ve nas dike cihê difikire. Ku mirov, wî ji nêzîk ve nas dike, gunehê mirov pê tê... Di her civatê de, di nav her civakê de yêñ ku ba-werî û qenaeta wan ne yek bin hene; hinek aştiwaz in, hinek ehlê şer in, rewa dixwazin û di navbera wan de hinek xwedî xuyêñ tifeyli hene. Ew kaselist in...

Ev Altemur Kîlîç lawê Kîlîç Ali ye. Kîlîç Ali celadê Atatürk bû. Ne tenê kur-d; li İzmîrê deh panzdeh mebûs jî idam kirine. Reisê "Mehkemeya İstiklalê" bû. Di heyeta wê mehkemeyê de sê Ali he-

bûn: Kîlîç Ali, Kel Ali û Ali Galip... Tu têkiliyê wan bi hiqûqê, zanîna hiqûqê tu-ne bû. Ali Galip doktor û her du yêñ din jî zabit bûn.

Cibiliyet, tiynet; bi zimanê xerbê di-bêjîn genoloji, ev di şexsiyeta insan de pir muhîm e. Yanê hinek aliyan insanan yê irsi bi talîm û terbiyeyê jî rast nabin. Yê ku cibiliyeta wî baş be, dibe ku di nav cemiyeteke xerab de talîm û terbiye bibe, lê dîsa ji tê de rehêñ baş, rehêñ edalet û insanetiye peyda dibin. Yê ku cibiliyeta wî xerab be, cibiliyeta wî ne baş be; dibe ku ew jî bi talîm û terbiyeyê bi şeklî hinek biguhere, lakin di eslê xwe de, ew aliyan wî yêñ xerabiyê tim di nava wî de, di xwîna wî de dilivin...

Li ser talîm û terbiyeyê Şêx Sadiyê Şirâzî di şîreke xwe de wiha dînîvisine: Aqîbet gurgzade ra gurgî şewed Gerçi ba ademî bi zûrgîşewed Yanê dibêje ku çiqasî çêjik û cewrikê gurê di nav benîademan de bimîne, terbi-

ye bibe jî, ew her çêjikê gurê ye... Netîce; eslê wî ci be, wê here ser eslê xwe.

Ez, Altemur Kîlîç baş nas dikim. Piş-tî darbeya 27'ê gulana 1960'î, em li Yas-sidayê nêzîkî sal û nîvekê di hepsê de li ba hev man. Mirovîn navtenik û tirso-nek e. Ü bêbir e, bîra wî mîna bîra mişkê ye. Lakin pozê wî baş bêhnê digire.

Ev kaselisten kemalîstan tim wer bû-ne; ji bona kût û hestiyen tim pal werdi-gerînin. İro jî di partiya Türkçe de ye. Ew jî, vî tiştikî zen dîkin, dibêjin em jê "is-tifade" bikin.

Ez rû bi rû wî bibînim, ez bîbêjim: "İca here bikeve Partiya Refahî. İhtiya-ciya wan zêdetir bi te heye. Ewê te dey-nin ser serê xwe. Lewra niha ew qerîbu-l ehdî dînê kemal in. Kilora te wê bas rûn bikin."

Tarîxa wê ne di bîra min de ye, lê ji bîst salî zêdetir e, di wextê iktîfîda Süleyman Demirel de, wî di Wezareta Ka-reñ Derve de ji bo Konsolosxaneya New-yorkê ji xwe re wezîfeyek dabû qebûlkîrin. Lê hîn imze nekiribûn, hikûmet gu-herî. Ecevit û Erbakan bûn iktîdar. Hat ji min re got: "Partiya Selametî qeram-meya min imze nake ku ez herim dest bi karê xwe bikim, mexdûr im, alî min bi-ke."

Ez çûm min ji Oğuzhan Asiltürk re got: "Her çendî ev lawê Kîlîç Ali jî be, hûn jê hez nekin jî (di esasê xwe de mex-dûrê wan ê mezîn em in) lê însaniyet e; her kesek ji xwe berpirs e, her kesek bi xwe hesabê xwe dide, imze bikin bila ev jî here. Jixwe yêñ ku Tirkîyeyê idare di-kin giş mîna wî ne, bila ew jî here."

Di navberê de zeman derbas bû.

Ev mumessilê cixareyên Philip Morris û Danhillê bû. Paşê bi dewlemendekî Bitlisî re li Bitlisî fabrikeya cixareyan çekirin. Wextê ixtîlafa wan hebû, dîsa hate cem min, ji min alîkarî xwest. Min alîkarîya wî kir. Heta em dawetî mala xwe kirin. Ji me re hurmet û ikram kir.

Lê ku wext derbas bû, dewran guherî, lingê wî erd girt û çû kete partiya Türkçe, ev zîlma ku tê serê me giş teswîp dike. İcar li hemberî zîlme ku em gazin dikin, dînalîn; nalîna me jî li wan giran tê... Di-bêjîn: "Zîlm bibe jî, nebêjin zîlm heye!" û wexta ku em têne lêdan, têne kuştin "Baş bûye, rind bûye..." di-bêjîn.

Di kurdi de ji bo hinek kesan dibêjîn, nankor, dibêjîn şîrheram... Kesêñ ku nankor û şîrheram bin, ev di qerekterâ wan de heye, naguherin. Ev mirov ne tiştik e, ez neqaîl im ku wî ji xwe te müxatap bigirim. Wexta ku were ba min, pê re dipeyivim jî, yanê tu kîn û xezeba min jî, ji bo wî tune. Ev mirovîn bîçük in. Ji bo hestiyekî, ji bo kûtekî, xwe difiroşin... Mirovîn ku sektebîet bin, were ne.

Min bavê wî jî nas kir. Di sala 1969'an de, ji partiya Büyük Tirkîyeyê aday (berendam) bû; ji min re got: "Ez li Zonguldakê berendam im; ji Azizoğlu re bibêje, bila min bixe serê listeyê, ez xis-time binê listeyê."

Paşê, ez û Yusuf Azizoğlu çûn li nav-çeya Zonguldakê, li Karabükê ji bo wî em peyivîn, me propaganda kir!.. Ev jî ya me ye... Her kesek li gorî şîrê xwe...



Dahûrîna peyvan (6)

Wekî her gavê, em dê dîsa peyvân hevedudanî yên ku ji aliye teşe û şeweyê ve guherîne û xera bûne, hildine dest. Hin ji wan peyvan wisan in ku zû bi zû ji wan nayê derxistin ka ew ji kîjan cureyên peyvan pêk hatine, lê hin jî hene bi hêsanî ji wan tê derxistin ku ew peyvân hevedudanî ne. Di vê xebata xwe de em dê çend tene ji wan, ji xwe re bikine mijara dahûrînê, lê bi awayê wan ên xerabûyi.

Canik: Peyv ji "ciwan" û "jinik"ê hatiye pê û tê wateya "leydî" ya Ingilizî.

Peyva "ciwanjinik" bi qonaxa demê re, bere bere li "ciwanik", "canik" û hwd. dageriyaye. Ku em ji bo peyva "canik"ê dest bi dahûrînê bikin û mijarê zelal bikin: Ji peyva "ciwan" tipen "i" û "w" yê, ji peyva "jinik"ê ji tipen "j", "i" û "n" yê hêdi hêdi ji peyva me ya hevedudanî ketine.

Di her du peyvan de (ciwan û jinik) tipa "a" yê tenê di peyva "ciwan" de heye; eger ji wê tipen "i" û "w" yê derkevin dimîne "can". Ji peyva "jinik"ê ji tipen "j", "i" û "n" derkevin dimîne "ik". Li vir em "ik" ê weki paşkîtekê (paşgirek) na'bîn.

Gava peyvân "can" û "ik" bêne ba hev, rewseke wiha derdikeve holê: Canik...

Divê em peyva "ciwan" jî şirove bikin; ji ber ku peyva "jinik" ji me re nas e, em pêdivî bi râvekirina wê nabînin. Tenê em bibêjin ku ew ji, ji "jin" û ji parkita (paşgira) "ik" ê çebûye.

Du wateyên (maneyên) peyva "ciwan" hene; yek jê xweşik, bedew e, ya din jî xortbûn e, yanê berevajiyê pîr û kâlitiyê ye. Ew peyv bi awayê "cihan" jî tê bilêvkirin. Nimûne: *Keç û xorten me di jî û emrê cihan (ciwan) de, di ber welat de serê xwe datin ser axa sar...*

Peyva "ciwan" li vir yanê di "canik" de di wateya xweşik û bedew de hatiye bikaranîn.

Camîr: Ev jî, ji "ciwan" û "mîr" pêk hatiye. Bi awayê "ciwamîr" jî tê gotin. Ew jî tê wateya "centîmen" a Ingilizî. Di vê peyva hevedudanî de jî "ciwan" di

O anik: Peyv ji "ciwan" û "jinik"ê hatiye pê û tê wateya "leydî" ya Ingilizî. Ciwanjinik, bi qonaxa demê re, bere bere li "ciwanik", "canik" û hwd. dageriyaye. Ji bo zelalkirina mijarê: Ji peyva "ciwan" tipen "i" û "w" yê, ji peyva "jinik"ê ji tipen "j", "i" û "n" yê hêdi hêdi ji peyva me ya hevedudanî ketine.

wateya xweşik û bedew de hatiye bikaranîn. Tiştên ku me der barê "canik" ê de gotin ji bo ya "camîr" jî em dibêjin, ji ber ku serencama peyva "canik" û "camîr" yek e.

Conega: Peyv ji du hêmanan, ji "ciwan" û ji "ga" hatiye pê. Ev jî, yanê "ciwanga" wekî peyvân "canik" û "camîr", li şeweyên "conege", "conga", "conge", "cange" û hwd. dageriyaye.

Çawa me li jorê jî da xuyakirin peyv di rastiya xwe de "ciwanga" ye, peyva "ciwan" jî di vê peyva me ya hevedudanî de di wateya "xort" de ye. Ciwanga,

yanê gayê ciwan, gayê xort...

Pekutî: Ji sê hêmanan ew peyva hevedudanî hatiye pê. Ji "pe", ji "kut" ê, ku raweya fermanî ya lêkera "kutandin" ê hatiye bidestxistin û ji tipa "î" yê. Em wan bînîn cem hev: pê+kut+î...

Bi tipa "î" yê di kurmancî de navdêr û rengdêr têne çêkirin. Nimûne: der+î, şîrîn+î... Peyv, di wateya pest, çewsandin û pêstûriyê de ye.

Sûravk: Peyv hevedudanî ye û ji sê hêmanan çêbûye: Ji "sûr", "av" û ji parkita "k" yê. Ji ava bi xwê re "sûravk" tê gotin. Digel vê, di cihê "sûravk" ê de

Fransiz ji xwê re dibêjin "sel" û ji şor re ji dibêjin "sale".

Ji ber ku "av" û parkita "k" yê tê zanîn em li. ser wan ranawestin. Em dê lê bixebeitin ku çawa guherîn di "sol" ê de çêbûye û li teşe û şeweyen "şor" û "stîr" ê dageriyaye.

Tipen "s" û "s", tipen "o" û "û", tipen "l" û "r" cih didin hev, yanê bi hev diguherin. Em bi bîr bînîn ku tipen jêderka wan yek e, bi hev diguherin. Bi nimûneyan em mijarê ronî bikin.

Ji bo tipen "ş" û "ş" yê: *serjekirin* û *serjekirin*, *pisik* û *pişik*

Ji bo tipen "o" û "û" yê: *honandin* û *hûnandin*, *serok* û *serûk*

Ji bo tipen "l" û "r" yê: *alikar* û *arîkar*, *lawir* û *rawir*

Bi van nimûneyan jî diyar dibe ku bê çawa guherîn di "sol" ê de çêbûye û çawa jî "sûr" peyveke xerabûyi ye, ji aliyê şeweyê ve.


Zêrzemin: Bi hêsanî jê tê derxistin ku ev peyveke hevedudanî ye û ji "jér" û ji "zemin" ê çêbûye; yanê jér+zemin...

"Zêrzemin", tê wateya penah, stareyê ye û "zemin" di wateya erdê de ye. Me li jorê got ku rastiya peyv "jêrzemîn" e, ne "zêrzemîn" e. Îcar em vê yekê bidin xuyakirin: Tipa di peyva "jér" ê de "j" li "z" yê dageriyaye. Jêderka wan her du tipan yek e. Em bi nimûneyan bidin eşke-rekirin bê "j" û "z" çawa bi hev diguherin: *jeng - zeng, jîrek - zîrek, jînar - zînar, jendî - zendî...*

ZANA FARQÎNÎ

Peyva pir mezin a nerast

CELALETTİN YÖYLER



Geli heval û xwendevanên hêja, ez dixwazim di vê nîvisa xwe de rûyê Partiya "Refah" ê, wî rûyê ku di binê perdeya reş de bi olê, çawa bi hezaran kesen bawermend dixapîne; derxime holê û bi we bidime nasîn.

Rêber û endamên vê partiyê di komcivînên xwe yên berî vê komcivîna xwe ya dawiyê de, dema ku sonda xwe ya taybet dixwarin, tê de digotin, "Em sond dixwin ku eme ji bo xweşî û alîkarî û piştevaniya hemû reben û belengazên misilman ên cîhanê bixebeitin." Lî vê carê qet qala reben û belengazên misilmanen cîhanê nekirin. Her qala parastina dewleta ku ew dibêjin "unîter" û qala parastina rejîma xwe ya fermî û ya jîyana şes mîlyar kesen di cîhanê de kirin. A sonda ji bo şes mîlyar kesen di cîhanê de, ew pir ne rast e û balkêş e. Ji ber ku kiryar û gotinên wan nakok in ji hev re.

Lewre ev heştê sal e, ji damezrandina vê komara tirkî hetanî vê demê, hêj li ser mebestêne tevkuiya gelê "kurd" zagonê: nîjadperestî û ne-mirovahî dertînin. Dema ku di sonda xwe de dibêjin "Eme ji bona şes mil-

yar kesen di cîhanê de xebatê bikin", derewan dikin, ew her dikarin xwe bixapînîn, nikarin edî kesen xwenas bixapînîn. Ji ber ku her kesen xwenas, dizanîn ku ev gotinên wan ên pir gir û mezin ne rast in, her derew in û ew gotin ji bo xapandina gelan in.

Lê eger ne derew e, rast be çima jîyana bîşt mîlyon kurd di Tirkîyê de napejîrîn? Hem jî, çima bi awayekî serbest xebata çapemeniya hemdem napejîrîn? Hem jî çima serbest xebata nîvîkarên hemdem û ya xudanên ramanên hemdem napejîrîn? Hem jî çima serbestiya têkoşîna parêzvanen mafêن gelan û daxwaz û xwestinên wan ên ji bo aşî û biratiya gelan û neteweyan napejîrîn?

Ev parti dixwaze ji bona şes mîlyar kesen di cîhanê de bibe alîkarê xweş-jîyana wan, lê çima hunermendê mezin û hêja Şanar Yurdatapan û civaknasê mezin İsmail Beşikçi û ewen'ku bi rastî û bi mirovahî xweş-jîyana şes mîlyar kesen di cîhanê de dixwazin diavîjîne heps û zîndanan?

Eger peyva Serokwezîr Erbakan ew a ku di komcivîna partiya xwe ya pêncemîn de digot "Em sond dixwin ku eme ji bona refah û seadeta şes mîlyar kesen li cîhanê bixebeitin" rast be, lê çima ev partiya hanê ya ku dibêje "Ez partiyeke kesen ku bi olê bawer in û alîkarê şes mîlyar kesen li cîhanê me", dîlén di zîndanan de bi daran û bi şîşan dikujin? Hem jî çima 30 kesen ji başûrê Kurdistanê dest û piyên wan girê didin û wan gulebaran dikin û pere û zêr û dolar, marken di bêrikên wan de talan dikin?

Ev kiryarên han ên pir xerab, hemû hem jî qat bi qat di dema karbidestîya vê partiyê de tene kirin.

Belê xwendevanên hêja, dema ku gotin û kiryarên kesan hev û din negirin, wê demê bawerî bi gotinên wan nayê kirin. Çawa jî ku Xuda ji bona şermezarkirina wan kesan di ayeteke Qurana pîroz de wiha dibêje: "Tiştê ku hûn nekin, eger hûn bibêjin, li bal Xuda bi xişmî gunheki pir mezin e." (El Şef: 3)

Belê, bi rastî divê ku gotin û kiryarên mirovan hev bigirin, lê eger hev negirtin wê demê bawerî bi wî kesî an bi wan kesan nayê kirinê.

Dîsa jî di "Konferansa Nehemîn a Xwendevanên Misilman ên Cîhanê de Serokwezîr dibêje: "Ola İslâmî dilovanî ye ji bo kesan. Mihemed jî her wisa, ew ji Xuda ji bo hemû kesen di gerdûnê de şandiye." Belê ev gotin ên rast in. Dîsa di wê konferansê de Erbakan wiha jî dibêje: "Di bingeha ola İslâmî de, aşî, jîyana xweş û bîratî heye." Belê ev gotin jî rast in. Lî gelo, ew devê ku ev gotin jê derdikevin çiqas li van gotinan dibe xwedî? Bi rastî hetanî roja îro rîberen RP'ê li tu gotinên xwe nebûne xwedî. Ango kiryar û gotinên wan ên ku ji me re qala İslamiyete dikin, hev û din nagirin. Bi sedan sal in ku kesen bawermend bi ıstîsmara olê xapandise û hêjî dixapînîn. Em gotina dawî bibêjin: Rovî nedîçû quiê, hijek jî bi xwe re girê tida. Vê partiya ıstîsmarkar xweş-jîyana kesen li Tirkîyê qedand û wê biçe hawara 6 mîlyar kesen li cîhanê...

Kapitalizm, nijadperestî û sînema

Ji destpêkê heta sala 1929'an pir filmên bêdeng hatine kişandin, mijarêwan pir ji hev cihê bûn, lê ji listikvanan bigire heta dekoran hemû tiştên bingehîn wekî ji hev dizibin, hatine bikaranîn. Pişti 1929'an ku Amerikayê sînemaya bideng icat kir her tişt tevlihev bû. Sînemaya îngilizan iflas kir û ji listikvanan bigire heta derhêneran, rejisoran berê xwe dane Amerikayê.

Di warê ragihandinê de pişti rojname û radyoyan, di sala 1895'an de icateke nû, sînema derkete holê. Edîson pişti icata ampûlê li ser negatif û makîneyen wêneyan xebat kir. Pişti icadkirina makîneya ku negatiffan dizivirine, sala 1895 bû destpêka sînemayê. Ev icat wê pişti çend salan di navbera dewletan de bibûya sedema şerên psîkolojik, ji bo serdestiya li ser bazara firotina filman û desthilatiya di vî warî de.

Vê icata nû pir bala dewletên kapitalist kişand. Bi vê navgîna ragihandinê dikaribûn xwe bigihandana her gelî, her civakê, hem ji aliye belavkirina îdeolojiya xwe ve û hem jî ji aliye aboriyê ve warekî pir muhim bû. Bi taybeti Amerika li ser vî warî pir bi baldarî disekinî û ji bo pêşvebirinê ji tu xebatî xwe nedida paş. Her roj icata Edîson bi teknikên nû bi pêş ve dibir. Bi van xebatan jî nedima şirketênu ku filman dikişinin, yên ku belav dikan û yên ku didine nîşandan, dan avakirin. Van xebatan wê di rojêne pêş de serdestiya Amerikayê di vî warî de derxîta pêş û dewletên Ewrûpayê nikaribûn bi Amerikayê re bikevine reqabetê, di naybera İngiltere-yê û Amerikayê de şerê bazara sînemayê wê dest pê bikira.

Di dîroka sînemayê de divê mîrov li şexsiyetên ku di vî warî de xebat kirine binêre, ka xebatêwan çiqas serkefti bûne, şexsiyetên wan çiqas li ser sînemayê tesîr kiriye.

Sînemaya Amerikayê

Di destpêkê de filmên kurt ên müzikal, şano û maçen boksê dihatin kişandin, wan jî pir bala mirovan dikişand. Li ser vê yekê kesen şanoger dest avetin sînemayê. Li Amerikayê, David Wark Griffith ku kesekî bi nav û deng e, di pêşvebirina sînemayê de, tê qebûlkirin cara yekem dest bi kişandina filmên dirêj kiriye. Filma wî ya heri balkêş û dirêj bi navê "Birth of a nation" (zayîna neteweyekê) ye. Vî filmî dawiya D. W. Griffith jî anî.

Griffith di şerê navxoyî yên Amerikayê de li hemberî bakuriyan şer kirbû û di wî şerî de ew zabit bûye. Ew şer jî bi awayekî şerê li hemberî kapitalizmê û bêmafûna resikan bû. Derhêner û rejisorê mezîn Griffith ku xwedî şexsiyeteke nijadperest bû wê jî di filmê xwe de derxîta pêş. Rexnegiran, rexne li nijadpesetiya wî girtin.

D. W. Griffith pişti re çend filmên din çekirin; yek ji wan jî "Intolerance" (Bêtahamûlî) bû û ew film ji wekî yên din li ser nijadperestiyê yanê nijadpe-

restiya Griffith bû. Lî ew derhênerê mezin bû qurbana ramanê xwe yên nijadperest û hêdî hêdî ji holê rabû.

Pişti Griffith peyrewêni wî Abel Gance, Joris Ivens jî bi heman mebestê li ser nijada raser rawestiyan. Abel Gance di 1917'an de bi navê "Mater Dolorosa", Joris Ivens jî bi filmê xwe yên bi navê "Çiroka Bayê" heman tişt diparastin. Li ser navê hunera sînemayê.

Joris Ivens bi filmê xwe yên Çiroka Bayê, pêvajoyeke nû di sînemayê de da destpêkirin. Ev film utopik bû, ji xeyalan pêk dihat. Ji aliye hunerê ve tiştên baş dihatine çekirin, lê bi tu awayî xîtabî gelan nedikir, hem jî doza raserbûna nijadekê diparastin.

Charli Chaplin û Elia Kazan

Bêguman Charli Chaplin û Elia Kazan di warê film çekirinê de û hunermendiyê de, kesen taybet û bêhempa bûn. Elia Kazan ji Stenbolê pişti Şerî Cihanî yên Yekemîn, bi malbata xwe ve koçî Amerikayê kiriye. Ew li Amerikayê di warê sînema û şanoyê de mirovekî serkevti tê qebûlkirin.

Kazan bi eslî xwe cihû ye û ji berzilma osmaniyan koçî Amerikayê kiriye. Li Amerikayê zanîngeh xwendîye û nijadperestiyâ li hemberî cihûyan dîtiye, gihişîye wê baweriye ku wê huner nijadperestiyê têk bibe. Di sala 1958'an de filmek bi navê "Gentlemen's Agreement" kişand ku tadeyên li nijadîn din tê kiri, ji xwe re kire mijar.

Elia Kazan bi vî filmî xelata Oscar stand, pişti wî filmî filmek bi navê "Pinky" kişand. Ew film ji li ser reşikan e. Kazan her timbi van filman, di rojevê de ma. Kazan bi van filmên xwe, ekola çepgiriyê xiste sînemaya Amerikayê.

Charli Chaplin jî di sînemaya Amerikayê de rengekî pir cihê bû. Tu kesnikaribû wekî wî bifikire, tu kesî nikaribû tiştê ku wî dikir texlît bike. Hostayê mezîn Chaplin bi tenê pirsgirêkên gel bi awayekî henekî hildan dest û bi şeweya xwe ya taybet dianî qada sînemayê. Filmên Charli Chaplin yên heri balkêş ev in:

"A Dog's Life" (Jiyana kuçikekî), "Pay Day" (Roja maaşê), "The Great Dictator" (Diktatorê Mezin), "A' king in New York" (Li Newyorkê Keyek), "Gold Rush" (Erîşa zêran).

Ji destpêkê heta sala 1929'an, pir filmên bêdeng hatine kişandin, mijarêwan pir ji hev cihê bûn, lê ji listikvanan bigire heta dekoran hemû tiştên bingehîn wekî ji hev dizibin, hatine bikaranîn. Pişti 1929'an ku Amerikayê sînemaya bideng icat kir her tişt tevlihev bû. Sînemaya îngilizan iflas kir û ji listikvanan bigire hetâ derhêneran, rejisoran berê xwe dane Amerikayê.



hîn wekî ji hev dizibin, hatine bikaranîn. Pişti 1929'an ku Amerikayê sînemaya bideng icat kir her tişt tevlihev bû. Sînemaya îngilizan iflas kir û ji listikvanan bigire hetâ derhêneran, rejisoran berê xwe dane Amerikayê. Di navbera İngiltere û Amerikayê de şerê psîkolojik dest pê kir. İngilizan kota danî ser filmên Amerikayê, Amerikayê jî, ji bo ku sûka filmên İngiltereyê bixe destê xwe, dest bi xebatênu kir. Bi avakirina saziyên nû şirketênu dest avetin dewletên cihanê yên sîyemîn. Bi anketan ci dixwaest derdixiste holê û li gorî daxwaza wan film çedikirin. Amerikayê hem bi riya filman îdeolojiya xwe ya fermî dixist mîjîyê mirovan û hem jî gelek pere qezenc dikirin.

Pişti şerê duyemîn, şovenîzm bêhtir derkete holê, edî kovboyen Amerikayê edalet belav dikirin, qehremanen wekî Marlon Brando, Clint Eastwood, Jak Nicholson, Sophia Loren, Marilyn Monroe, Robert Redford, Faya Dunaway, Robert de Niro, Cevin Costner li her derê leheng bûn.

Filmên li hemberî kommunîzmê, filmên qetliama çermisoran, filmên kus-tin, û talanê li her welatî nijadperestî û îdeolojiya Amerikayê belav dikirin.

Sînemaya Ewrûpayê

Li Ewrûpayê jî sînema ji destpêkê heta salên 1945'an di bin bandora bir û baweriya nijadperestan de bû. Li Almanyayê ji salên 1920'an bigire heta 1945'an pesnê rejîma Hîtler û pesnê raseriya nijada alman bû mijara filman. Di sala 1920'an de filmek bi navê "Tehe Golem", di sala 1922'an de ji "Dracula" çekirin, armanca van filman reqabeta bi Amerikayê re bû, bi ser neketin. Li gorî nirkandina rexnegirê sînemayê, tempoya filmên almanî pir giran, mijarêwan tevlihev, îdeolojiya nav wan nijadperest bû, lewre ji ji aliye dîtbâriye ve dewlemend bûna ji, bi sînemaya Amerikayê re nikaribûn biketana reqabetê. Lî, filmên Amerikayê ji sedi heşte li Almanyayê qedexe bûn.

Pişti Şerî Cihanî yên Duyemîn sînemaya alman rengekî nû girt, filmên psîkolojik ên perwerdehiyê, çandî û hunerî hatin çekirin. Bi tenê di sînemaya Almanyayê de kesekî qedexekirî Bertolt Brecht, di bin faşizma Hîtler de filmên perwerdehiyê yên hunerî çekirin, lê filmên wî hatin şewitandin û ew jî hate cezakirin.

Sînemaya fransızan jî, ji ya dewletên Ewrûpayê yên din cihêrentigir nebû; di bin tesîra sînemaya Amerikayê de bû, lê mijarêwan filman hineki cihê bûn. Filmên fransız, bi piranî filmên komedi, mafya û dîrokî bûn, di filmên dîrokî de jî zêdetir Napolion derdixistin pêş.

Derhêner û rejisorê mezîn, René Clair bi filmên komedi hemekîn xwe bi sînemaya Amerikayê dikirin.


Li aliye din, derhênerê Polonyayî Andrzej Wajda filmên polîtik ên hunerî, yên serhildana gelan çedikirin, ji ber wê yekê jî, ji Wajda re digotin komünîstî sor. Filmê Andrzej Wajda yên bi navê "Pokolenie" (Nivşekî Nû) bi her awayî hunermendiya wî derdixiste hole.

Li Çekoslovakya, Danîmarka û Swisreyê jî filmên hunerî yên ku gel perwerde dikin, hatine çekirin. Lî wan filman nikaribû li hemberî sînemaya Amerikayê deng vedin.

Li İtalyayê jî Roberto Rossellini reberiya sînemayê kir. Rossellini rengekî nû anî sînemayê, bi destpêkirina pêvajoya Neo-Realismo, yanê realizma nûne tenê li İtalyayê li her derê cihanê bal kişand. Rossellini bi filmê xwe yên bi navê "Roma Bajarekî Vekirî" deng vedâ. Wî filmî bi awayekî sînemaya İtalyayê jî temsîl dikir. Bi filmê "Sala Almanyayê ya Sifir" jî hovîtiya şer dianî berçavan. Pişti Rossellini sînemaya İtalyayê jî çû ser darûberê (dirûvî) sînemaya Amerikayê; filmên mafya yên gangisteran derketine pêş.

Pişti re em dê wekî mijareke serbixwe li ser kurtediroka sînemaya rojhîlatê bisekinin.

METİN AKSOY



● 12.11.1994: Parêzer Medet Serhat li Stenbolê bi destê hêzên tarî hate kuştin. Medet Serhat li gorî projeya qetilkirina kurdên sereke yên welatparêz ji holê hat rakirin. Parêzer Medet Serhat bi şev tevî pîreka xwe bi êrîşa qatilan mir, pîreka wî bi birîndarî xelas bû. Serhat wekî din jî sazımarkarê TOHAV'ê bû. Medet Serhat bi besdariya hezaran li Goristana Zincirlikuyu hate hilanîn.

● 16.11.1938: Serokê serhildana Dêrsimê Seid Riza li Xarpitê bi lez û bez hatin darvekirin. Di bîrânîhê xwe de İhsan Sabri Çağlayangil dide xuyakirin ku darvekirina Seid Riza û hevalen wî roja yekşemê bêmehkeme hate pékanîn û bi xîreta râberî û aîşkariya Çağlayangil berî hatina Atatürk

Li Xarpitê avêtin dar. Ji bo ku Janeke mezin bidin Seid Riza, pêşî kurê wî Usenê Reşik li ber çavên wî avêtin dar; wekî hemû hevalen wî.

● 15.11.1918 : Pişî şerê Cihanê yê Yekemîn ji bo ku dawî li şer bê, li bajarê Swisreyê Servesê peymanek hate imzekerin. Ev peyman bi navê wî bajarı tê nasîn. Vê peymanê bi her awayî Almanya û İmparatoriya Osmanî dixiste binê gelek barêne giran. Li gorî vê peymanê erdê osmanîyan li welatên serkefî dihat parvekirin. Her wiha di peymanê de qala otonomî û serxwebûna kurdan jî dihat kirin.

● 15.11.1922: Rojnameya Rojî Kurd li bajarê Silêmaniye dest bi weşanê kir.

AWIR

Konferansa dîroknîsîna kurdî

**Prof. Dr. Celîlê Celîl li ser
Îdrîsê Bidlîsî hin tiştên balkêş
gotin ku heta iro yên ku hati-
bûn pejirandin hemûyan dike
mijara geneşiyê. Wî got ku
Îdrîsê Bidlîsî, her ku ci kiribe,
di wê rewşê de ji bo gelê
kurd kiriye.**

Di 3'ye sermawezê de li NÇM'ya Stenbolê konferansek bi navê "Konferansa Gelşen Metodolojîk ên Dîroknîsîna Kurdi" pêk hat. Konferans ji aliyê Enstituya Kurdi ve hate sazikirin.

Ji Zanîngeha Viyanayê Prof. Dr. Celîlê Celîl, Torî, Mevlüt Çetinkaya wekî axivger besdar bûn. Gere Gûrdal Aksoy û Prof. Dr. Martin Von Brunsen jî wekî axivger besdarî konfîrancê bibûna, hate diyarkirin ku ji ber hin sedeman besdar nebûne. Ji aliyê din ve Dr. Cemîd Bender, Cemîl Gündoğan û Prof. Dr. İsmet Şerif Vanlı û M. Can Yüce jî teblîx şandin konferansê.

Axivgerê yekemîn Prof. Dr. Celîlê Celîl bû û yê ku tenê bi kurdî axivî jî ew bû. Axaftina wî li tirkî hate wergerandin. Celîl di ayaftina xwe de bi zêdeyî li ser terza nîvîn û ayaftina rewşenbiran sekînî, bi taybetî jî li ser geneşîya navbera dîrokzanan peyivi. Celîlê Celîl, xwest ku rexne tu car wekî súcdarkirinê neyê bikaranîn. Ew tişt ne rast e. Wekî din jî li ser Îdrîsê Bidlîsî hin tiştên balkêş gotin ku heta iro yên ku hatibûn pejirandin hemûyan dike mijara geneşiyê. Wî got: "Îdrîsê Bidlîsî, her ku ci kiribe, di wê rewşê de ji bo gelê kurd kiriye." Li gorî Celîlê Celîl, wê çaxê dewleta Sefeviyan li dijî súniyîn kurd gelek zilmkar bû, wê yekê jî kurd nêzîkî osmanîyan dikirin. Her wiha wan heta wê çaxê jixwe zilma Osmaniyan jî nedîtbûn.

Torî jî zêdeyî li ser eşîrên hurrî rawestîya. Diyar kir ku "heke ku li ser dîroka gelekî bê sekinîn, divê ziman materyala herî mezin be. Bêguman gava ziman hev û du bigirin divê tekiliyeke xurt hebe. Ji ber vê yekê jî tekiliya zimanê kurdî û zimanê qebileyen hurrî bi vî rengî ye.

Ji Enstituya Kurdi Mevlüt Çetinkaya ji bo metodolojiya nîvîsîna dîrokeke rast, pesnâ metodolojiya materyalizm a dialektikê da. Wî diyar kir ku bûyerên dîro-



kî bi yek awayî tu car neyê şirovekirin û nîrxandin. Ev terz xelet e, şerî çîmî tê guherîn, divê ev rastî her tim di bîra dîrokzanan de be. Di konferansê de teblîxên nîvîkî pêşkêşî temaşevanan bûn. İsmet Şerif Wanlı di teblîxa xwe de li ser sînorê Kurdistanê rawestîya û got: "Dîroknîsîn xebateke bi zanayî dixwaze. Divê lêkolîner û dîrokzan vê bizanibin, bi awayekî baş binirxînin. Ev jî jixwe bi back-grounda çand û jiyana wan ve girêdayî ye."

M. Can Yüce jî di teblîxa xwe de li ser metodolojiye, bi awayekî din rawestîya û daxuyand ku dîroknîsîn her tim bi ideolojiyan ve gîredayî ye. Wî got: "Ew ancaz bi awayî şerî çîmî tê guherîn, divê ev rastî her tim di bîra dîrokzanan de be ku bi ya me têgîna dîrokê bi wê tarzê re xurt têkîdar e. Em dizanîn ku dîrok çêkirin û dîroknîsîn bi hev re gîredayî ne." Cemîl Gündoğan jî di teblîxa xwe de li ser ekolên dîrokzaniya kurdî sekinî û da xuyan ku di dîroknîsîna kurdî de berê xebatêne kevn nehatîye kirin. Lî di xebatêne nû de jî du ekol hene. Ji van ekolan a yekemîn "Dîroknîsîna reaksiyoner", a duymîn jî ekola: "Areaksiyoner" e. Dîroknîsîna reaksiyoner wekî negatifî dîroknîsîna fermî ye. Ev xelet e. Rastî ya duymîn e.

Konferans bi eleqyeke baş, bi pirs bersivan qediya.

EZNAS MAYA

ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT



Windayê me

Em di nav kitêb, berhem û bîrânînê rewşenbirê serdest de li windayê xwe digerin. Em ji vir û ji dera han pêjna wan dikin, tiştinan li ser wan dibihîzin û li ser vî esasî jî em dîbin xwedîyê hin netîcîyê teqez û qutbir an jî texmînî. Windayê me zehf in; hin ketine terkîn bin erdê, hin di qozî û kavilan de mane û hin jî heta berî mirinê bi çend rojan kes nîzane kurd in. Wa diyar e rewşenbirê neteweyê bindest bi piranî wiha ne, şermok in. Behsa xwe, malbat, bapîr û pêşiyê xwe nakan. Wê çîma bikin? Cihê jê tê, neteweyâ ku miensûbî wî ne bêqedir û bêqîmet e, bêxwedî û bêxwedan, bêdewlet û bêotorîte ye. Wê behsa xwe û ci bikin? Di vê de ne huner heye û ne keramet û ne jî nan û mezînahî. Jixwe kurd belengaz in, cihê wan di nav civatê neteweyan de tune, cihê wan di nav perşîkesî û jîrdestan de ye, ne kariyer û ne jî nav heye di kurdbûnê de.

Rewşenbirê berê heta ji wan tê xwe ker û nebîhîstî dikin, naxwazin cih û devera jê hatine, bibe behs. Çend malbatênu ku nas in û sırgûn bûne ne tê de, kêm zêde rewşenbirê ku bûne memûrên dewletê rewşa wan wiha ye.

Em di kitêbeke nîvîkarê tîrk Haldun Taner de (Ölürse ten ölü, canlar ölesi değil) li navekî dirêi rast hatin. Nav İbrahim Mukrimîn ibni Halil Kamil, ibni Mehmet Sakîb Elbistanî ye. Em ji vê kitêbê pê dihesin ku ne ji adetên Elbistanî bûye ku behsa xwe bike. Lî çawa dibe rojekê xwe ji bîr dike û ji rojnamevanekî pir nêzîkî xwe re hin tiştan dibêje: "Qebileya me ji Elbistanê ye. Bav û kalên min, ap û xizmîn min giş qazî û mamoste bûn. Min dibistana destpêki û ruştiye li Anadolê xwendin. Ez piş re çûm Stenbolê. Sala 1919'an ez ji Fakulteya Edebiyatê ya Darulfunûnê Beşa Dîrokê mezûn bûm. Piş re ez ketim mulkiyeyê. Sala 1921'ê min ev der jî qedand.... Demekê min di Dîroka Encümeniya Osmanî de mîna hafîzî kutub kar kir. Sala 1925'an vê encümenê bi mebesta kopyekirina wan kitêbên ku di Kitêbxaneya Stenbolê de peyda nedibûn ez şandim Fransayê. Ez heta sala 1927'an li Parisê mam. Min di kitêbxaneyan de lêgerîn û lêkolîn çêkirin. Pişî vegera xwe, min hem memûrîya xwe li kitêbxaneyê domand û hem jî di ber re min li lîseyen Kabataş û Galatasarayê mamostetî kir."

Nîvîkarê kitêba navbiraw didomîne: "Min mamoste di van salê Galatasarayê de nas kir. Ez bûm şagirtê wî. Dem tê re derbas bû, mamoste bû ordinaryûs profesorê qırnê navîn û ez jî mîna mamosteyekî dîroka huherê bûm hevpîşeyê wî. Ew alim û mirovî dawî bû li ser rojhîlat, mirovîkî hafizeye xwe kêm kes mîna wî hebûn.

Gerek we bi çavên serê xwe bidîta gava behsa cenga Uhudê yan jî Xendegê dikir. Te digot qey ew bi xwe di şer de ye, çavên wî, xetîn rûyê wî hereketen dest û lingîn wî bi yê servanen re dibûn yek. Bi wan re awir vedidan, şû dihejand, kef bi devê wî diket, hêrsen wî dihatinê û gava şer diqedîya kafir dişkestîn, bêhna wî derdiket, rûyê wî vediûb, geş û xweş dibû... Gava ku derdiket ser kursiyê û diaxivî derya û dewle-mendiya zanebûna wî mîna şelaleyekî diherikî û dihat xwarê.... Temenê wî di nav xwendegeh û kitêbxaneyan de derbas bûbû. Azib bû, nezewicî. Mirovîkî nuktedan bû û bi xwe jî singfireh bû ji bo qerf û nukteyan".

Ji meqaleya Haldun Taner mirov nas dike ku Elbistanî mirovîkî durist e, gîredayî karê xwe ye û navbera wî û rejîma kemaflîst jî ne zêde baş e. Li aliyê din ew rojhîlat-nasekî di ser xwe re ye û di vî şaxî de "alîmîn mîna wî kêm peyde dibûn". Ew her wiha lêkolînerekî bikapasa û xwedî hejmarek berhem e. Lî tiştê hêjâyî gotinê ew e ku ne bi tenêisporekî dîroka İslâmê û rojhîlata navîn e, lê belê wî bi bir û hafizeye xwe jî deng daye: "Gava gotin tê ser hafizeyê, mamoste fenomenekî xweser e. Bêwestan dixebeitî û dixwend. Bi van xisleten wî re mirov li hafizeye wî dima heyir. Tê gotin ku rojekê bê qelem û kaxiz diçe Bibliothèque National û metneke pênc rûpeli dixwîne. Tê otela xwe û her pênc pelan bê ku tiştîkî jî bîr bike, dînîvîsîne."

Dawî ev dikare bê gotin: Ecêb û balkêş e ku mirovîkî ew qas bi dîrokê re radibe û rûdine cardin jî xwe nas nake û ji bo gelê kurd du peyvîn heq û di cih de nabêje.

Dîroknavîsên me bi cureyê çîrokî dînivîsim

**Em kurd ji aliyekî ve
ji pirsa "Em kî ne?" re
li bersivê digerin, ji aliyê din
ve jî bi awayekî dengî em
xebatênu dixwazin ji wê
pirsê re bibine bersiv
gengeşî û rexne dîkin.
Ew yek jî bi piranî li ser
metodê diqewime.**

**Prof. Dr. Celîlê Celîl, pirsên
hevalên me Nîjad Yaruk,
Zana Farqînî Û DÜZGÜN
DENİZ ên li ser metoda
nivîsîna dîrokê û xebatênu
dîroknîvîs û dîrokzanen
kurd bersivandin.**



Prof. Dr. Celîlê Celîl di sala. 1936'an de li Erivanê hatiye dîneyê. Ew ji malbateke nas, ji Malbata Celîlan e. Celîlê Celîl bi xebatênu xwe yên li ser dîrok, folklor û edebiyata kurdî tê naskirin. Bi taybetî warê wî yê pisporiyê dîrok e, dîroka sedsaliya 19'an û destpêka sedsala 20'an a kurdan.

Ew niha li Beşa Miletnameyi ya Universiteya Viyanayê xebatênu xwe berde-wam dike. Prof. Celîl diyar dike ku tevî hev, ci çapkirî û ci jî neçapkirî li dora sî û pênc, cil berhemên wî hene. Xebata ku vê gavê li serê dixebite ji amadekirina 'Kataloga Destnivîsarênu Kurdi yê Kevn' e.

Celîlê Celîl hefteya çiyî wekî axiver beşdarî "Konferansa Gelsênu Metodolojîk ên Dîroknûsına Kurdi" bû, ku ji aliyê Enstituya Kurdi ya Stenbolê ve di 3'ye mehê de li salona Navenda Çanda Mezopotamyayê hate sazkirin. Beriya konferansê me xwe gihandê.

Birêz Celîlê Celîl, hûn çar sal berê, ji bo vebûna Enstituya Kurdi hatibûn Stenbolê. Ji wê demê heta niha bi ya we ci guherîn çebûne, di cepheya kurdan de?

● Ez gelek guherînan dibînim. Dos-tênu min, nasen min gelek hebûn wekî rewşenbîr, rojnamevan, karkerênu Na-

venda Çanda Mezopotamyayê. Niha ez wan nabînim. Lî xort û keçen me yê dilovan cihênu wan girtine, karênu rewşenbîriyê dimeşin. Ez çalakiyên wan ji dûr ve dibînim û ez ji wan gelek razî me.

Guherîna din jî ev e: Ez dibînim ku ûro meydana rewşenbîriyê di nava kur-dan de gelek fireh bûye. Berê rewşenbîr ji aliyê emir ve mezin bûn, niha xort ji gelek in. Xwendevanî, xwenaskirin, xweamadekirin êdî ketiye nava vê nifşê ku ew duwaroja me ye.

Metodolojiya nivîsandina dîrokê ji bo hemû gelan yek e. Rast dînivîsin, objektif, bi zanyarî (ilmî), bi profesyonelî problemen ku datînin ber xwe safî dikin, bi krîtik û li ser bingeha çavkaniya wê nivîsarê. Ev, ji hemû dîrokvanan tê xwestin.

Ez jî tiştekî pîroz e. Bi baweriya me ger xwenaskirina milî, di nav gelê me de cihe xwe bigire wê hê xurttir bibe.

Cara pêşîn gava hûn hatibûn, Apê Mûsa hebû. Lî vê carê ew nîn e. Gava we bihîst ku Apê Mûsa hatiye kuştin, hûn bi ci hesiyan?

● Ez gelek gelek bi ber ketim. Apê Mûsa xwedî jiyanekê zehf dewlemed bû. Şewqa wî wisa zêde, wisa fireh bû... Eger Apê Mûsa bi fizîkî ne di nav me de

be jî, ew bi xisleten xwe, bi mirovhezi-ya xwe, bi dilovaniya xwe, bi zanîna xwe zindî ye.

Îro ev wesfîn wî, miletperveriya wî derbasî keç û xorten me bûne ku, ew li ser riya wî ne û cihê wî vala nehiştine.

Li ser gelşa metodolojîk ên nivîsîna dîroka kurdî em dixwazin fîkrîn we hîn bibin. Hûn dikarin ci ji me re bibêjin?

● Metodolojiya nivîsandina dîrokê ji bo hemû gelan yek e. Rast dînivîsin, ob-

jektif, bi zanyarî (ilmî), bi profesyonelî problemen ku datînin ber xwe safî dikin, bi krîtik û li ser bingeha çavkaniya wê nivîsarê.

Ev, ji hemû dîrokvanan tê xwestin. Lî, ji bo nivîsandina dîroka kurdan helbet hinek sert hene, ku ew xusûsiyeten dîroka me ne.

Mesela miletên cînarênu me, dîroka wan hemû bi zimanê wan hatiye nivîsandin; ji berê ve. Dîroknîvîsên me tune bûne. Dîroknîvîsekî me yê xuyan heye,

serbilindahiya me ye. Ew jî Serefhanê Bitlisî ye, lê wî jî bi farisî û tirkî nivîsi-ye.

Me bi zimanê dê, çavkaniyên xwe yên dîrokê nenivîsandine. Tişte me nivîsiye ya bi tirkî ye, bi farisî ye, ya jî bi erebî ye. Ev xusûsiyetek me ye. Ev yek. A diduyan. Hemû cînarênu me li ser me nivîsine. Ew jî li gorî dilê xwe dînivîsin, subjektif in. Gava em dîroka xwe binivîsin, gerek e, ne tenê em çavkaniyekî hildin, çavkaniyên erban, çavkaniyên farisan hene, gerek e em hemûyan hildin.

Gelek milet hene ku rojnameyên wan, kovarênu wan du sed sal e çap dibin bi zimanê wan. Wekî tirkan, ermenian. Eger ew bixwazin dîroka nêzîk, sedsaliya 19 û 20'î binivîsin, diçin li rojname û kovarênu xwe jî dinihêrin.

Niha hûn tişte ku dibe, wekî rojname dînivîsin. Sed sal bi şûn de, yê ku bixwaze, rojnameyên kurdi êdî dikare veke. Rojnameya ku hûn derdixin, bingeh e, çavkaniye ji bo dîroka roja ku bê. Ji we jî tê xwestin ku hûn zêde agahî bidin, objektif bin.

Gerek e, dîroknîvîsên me hay ji vê xusûsiyetê jî hebin. Problema mezin ew e, dîroknîvîsên me hinekî bi cureyê çîrokî dînivîsin. Yanê bi salan li serê naxebitin, xwe naêşin ku li hemû çavkaniyên ku me got bikolin, vekin, lê binêrin

D

îroknivîsên me hinekî bi cureyê çîrokî dinivîsin.

Yanê bi salan li serê naxebitin, xwe naêşînin. Mesela, wexta problemekê deynin, binêrin ku çavkanî hindik e gere bi pey bikevin, wan peyda bikin. Hema tiştek dikeve destê wan li serê xeber didin wekî çîrokê.

û binirxînin.

Mesela, wexta problemekê deynin, binêrin ku çavkanî hindik e gere bi pey çavkaniyan din bikevin, wan peyda bikin. Hema tiştek dikeve destê wan li serê xeber didin wekî çîrok. Li ser wê ji, te hew dît ku mehê pirtûkek çap kirin.

Ev tiştên wiha di dîroka hemû miletan de heye. Hinek pirtûk hene ku ew ji bona rojê ne. Ew pirtûk qîmeta xwe zû winda dikin; çend sal bi şûn de kes devê wan venake. Ew ne zanyarî (zanistî) ne, ne nîvîsarêñ giran in. Pirtûk hene ku du sed sal, sê sed sal jî xelk devê wan vedi. Dêmek bawerî bi wan heye û hem jî giraniyeke wan heye. Metodolojiya zanîriye heye.

Ev jî ji çi tê? Em li ser kadroyan na-sekinin. Gere em jî roja ku zarok diçine dibistanê, li serê bisekinin. Daxwaza wan, meyla wan eger li dîrokê be em guh bidine ser wan ku ziman hîn bibin. Zimanê hemû miletan ku li dora me ne, yên ewrûpi...

Çimkî kurdzan, bi sê zimanan nikare bibêje ez kurdzan im. Kesê ku dîrokê dinivîse herf kêm gerek e bi heft hest zimanan bizanibe. Barê me giran e, ewê nîvîsarêñ me yêñ bingehîn çêbibin. Lê ev jî, bi carekê çenabîn, hêdî hêdî çêdi-bin.

Di nav dîroknivîsan de, li vir gengeşiyek heye.. Em nizanin gelo haya we ji wan pirtûk û gengeştyan heye?

● Bi daxewe, piraniya wan pirtûkan min nexwendîye, çimkî bi tirkî dinivîsin. Ev jî kêmâniya min e. Lê li gorî ku ez fêm dikim, ew gengeşî çenêdibûn ku ew kitêb li ser bingeha çavkaniyan bihatina nîvîsandin.

Heke ji bo îspatê tu serî li gelek çavkaniyan bixî, tu gelek nimûneyan pêşkêş bikî, tu bibêjî filankes wiha gotiye, bêvan kes wisa gotiye, wê gavê şik namîne wekî gotina te rast e.

Eger gengeşî li ser materyalê bê kîrin, dêmek materyal kêm e. Eger tişte bîr û baweriyê be, ew jî tim dikare bibe problema gengeşiyê.

Gengeşîya heyî ya di warê dîroknivîsîna kurdî de bêhtir li ser dîroka serdema pêşîn, dema berê ye. Bi ya we divê xebat çawa bê kirin?

● Ev e sî sal, cil al e ez bi dîrokê re eleqedar dibim. Ez ditirsim nêzîkî wê demê bibim. Çimkî ez ne hosteyê wê demê me. Belê ez dîrokzan im, lê gere ez dema Mîdyayê, dîroka wê, zimanê wê, kultura wê, arkeologiye wê bizanibim.

Ne tenê ew jî, gere em ya cînarêñ wê jî bizanibin. Ka wan ci kiriye. Gere ez zimanê mixî (bîsmari), zimanê mirî bizanibim. Û ez bibim profesyonelê wê demê. Wê çaxê ez dikarim bibim xwedî gotin.

Ê ku tiştekî kevn dibîne hema dibêje ew yê kurdan e. Ev ne şixulê (karê) zanîriye ye. Navê kurd kengê bi pêş de hatiye. Ev çax tiştek li ser kurdan bê gotin rast e. Lê berê bi navekî dinê bûye, de

îspat bike, berê pêsiyên me kî bûn, kijan grûbêñ etnik di etnosa kurdan de dewra xwe listine? Kî ne, dîroka wan veke, zimanê wan veke, di tradisyonên wan de tiştên kevn bibîne, ku iro di nava kurdan de hene. Belê, ev tiştekî kompleks e. Hem ziman e, hem arkeolojî ye, hem topografiya ye, yanê xebata li ser eşîran û cih û waran e, yanê her alî ye.

De içar em bibêjin, ên ku a nika li ser wê demê dinivîsin van pirsan bi vî kûrahiye ve datînin, na. Lewma jî li serê gengeşî çêdibe. Ev nexweşiyek e, ev kêmâniyek e. Hema em dibêjin ev a me ye û ji me çêbûye.

Rast e, em gelek kevn in, lê gere ev tişt bi zanyarî bêne kolandin. Ne ku ji bona civînên ku hezar kes tevlî bûne tu bibêjî “Em kurd mîdi (medyayî) ne, em hitî, em lûlû, subarî ne” te got û derbas bûyi. Ev ne dîrokzanîti, dîroknivîsîti ye.

Ji bo lêkolîn û lêgerîna li ser dîrokê ji du metodan tê behskirin. Yek jê, ji serdema pêşîn tê destpêkirin û heya roja iro tê. A din jî ji iro tê destpêkirin û ber bi serdema pêşîn diçe. Ji bo kurdan hûn kîjanê bas dibînin?

● Bi dîtina min a duduyan, lê gere ji dewra xelîfeyan bê destpêkirin û ber bi serdema pêşîn here. Ne ku ji iro dest pê bê kirin û bi paş ve here. Çimkî navê kurd ji dema xelîfeyan ve tê zanîn û xuya ye. Tu dikarî ji sedsla heftan bêyî vir.

Helbet tu nikarî wisa binivîsi. Tu wisa dikarî bikolî. Gava tu binivîsi tu nikarî paşû pê herf. Gava te lêkolîna xwe kire pirtûk gerek e tu rast bêyî, yanê ji dema berê bêyî.


Em dizanîn ku hûn li ser sedsaliya 19 û destpêka sedsala 20'an xebatên xwe dîkin. Li ser serdema pêşîn û navîn xebatên we hene?

Na, xebatên min li ser wê demê nîn in. Xwendina min li ser wê demê heye. Bîr û bawerîya min heye, dîtina min heye. Ez dikarim sohbêté bikim.

Gelek kesen biyan hene, çaxa li ser serdema pêşîn şixul dikin, rastî hin tiştên ku bi kurdan re eleqedar e tê, di ser re derbas dibin, nabêjin. Endişeyen wan ên politik hene. Ev heqê wan e jî. Sûbjektif dibin ci dibin, ew ne jî me ne. Gava kesen ji me binivîsin, derbas nabin ji kurdan. Ez nimûneyekê bidim. Zanayekî gelek meşhûr heye, navê wî Dyacanov e, bi rûsî dîroka medyayî nîvîsiye. Lê her tişt bi dîroka Azarbeycanê ve gîrê daye. Li gelek cihan lazim e bibêje kurd, lê nabêje. Kitêba wî li Iraçê jî çap kirin, hêja ye li Tirkîyeyê jî bê naskirin.

Navê kurd nedaye, ji ci ye? Xuya ye tîrsiyaye ku wê jê re problem çêbibe. Dêmek ji me tê xwestin ku em bikolin, bi çavê xwe, bi dilê xwe, bi mîjîyê xwe. Ev erdê ku em li serê dijîn ê bav û kale me ye, lê em li dîroka vî erdî xwedî derneyen.

Gava hûn xebatên xwe dîkin, ci tişt



wekî asteng derdikevin pêşîya we?

● Niha, îmkanên min ji bo nîvîsandi ne ji aliyeke ve zêde bûye, pişî ketina Sovyetî, ji aliyeke ve jî kêm bûye. Berê ez bê xem bûm, her guhdariya min li ser karê zanîriye bû.

Ez niha li Ewrûpayê me, karê min wextê min dixwe. Ew karê ku ez pê ji-yana xwe didomînim. Lê min arşîva

P

artî wek organîzasyonên siyasî xizmeta xwe dîkin, ji bona mîletan, ne tenê ji bona kurdan. Xizmeta wan ji bona azadiya gel e. Dêmek azadiya kultura gel e. Gava tu xizmet dikî, qîmeta rewşenbiran gerek e bizanibî, ku ew çawa xizmetkarên kultura gel in.

xwe bi xwe re aniye, ez li serê dixebeitim. Çapkirina wan ji min re problem e.

Kurd niha pirsa “Em kî ne” jî ji xwe dîkin, li kok û pêşîyen xwe digerin. Kesen biyan ji ber endişeyen siyasî û akademik navê kurdan bi lîv nakin. Li Bakur ji şert nemusaîd in ku jî destpêka dibistanê ve kesen ku meyla wan li ser dîrokê, arkeolojîyê û hwd. hene bîn tespîkirin da ku ew sibê roj karibin li ser dîrokê xwe bixebeitin...

● Niha bi hezaran kurd li Ewrûpayê ne. Îmkanên wan hene ku zimanen hîn bibin. Ev jî fersendek e ku kurd ketine Ewrûpayê, bûne muhacir. Ev fersendek

e ku kultura Ewrûpayê, zanîna wê hîn bibin.

Li Viyanayê, ev e deh pazdeh sal e carekê neçûne muzeyê, min kurdekkî kitêbxaneyê de nedîtiye. Ev ji dê û bavan tê xwestin.

Esil ne ew e ku tu li İranê bî, li Iraqê bî, nizanîm tu li ku derê bî û bibêjî rî tu-ne ye. Rê heye, ev di destê dê û bavan de

ye. Tu kes nikare mudaxeleyî wan bike. Ên ku zarokên xwe mezin dîkin ew in.

Mesela pirtûkên bi kurdî nakirin ji ci ye? Ji ber ku qîmeta zanîriye, qîmeta pirtûkî li ba wan tune. Dikarin nizanîm çend caran te dawetî aşxaneyekê bikin û bi milyonan pere xerc bikin ji bo te, lê pirtûkî li ba wan tune. Dêmek kultura hezkirina pirtûkî di nav me de hê çenebûye.

Ji aliye dinê, xwehesîna kurdîtiye li cem me tune. Ku tu ji yekî re bibêjî tu ne kurd i, wê bixeyide û bibêjî çawa ez ne kurd im. Ku tu bibêjî ka kurdîti ci ye? Nikare bersivê bide te.



Şaheng

Zilan, şahenga bajarê Dêrsimê
Dêrsim şanê welat
Welat can e, ruh e
Can Zilan e
Zilan dastan e
Dastan azadî û jiyan e.
Azadî çira ye
Çira li ser bedena Zilanê ye...

Ew roj,
Ruhê Seyid Riza diliviya.
Wê rojê,
Ew bûbû nifteya deriyê bihuştê.

Dêrsim şanê welat
Welat navê jiyanê ye
Zilan e jiyan...
Zilan, axîna Gelyê Zilan
Gelyê Zilan,
Birîneke kûr û reş bû
Zilan derman bû.

Ew roj,
Sewal ji can direviyan.
Can xwîn nedixwest.
Xwîn,
Hawar,
Gaziya milyonan e
Ü milyonan milyon in
Mirov in
Ü dastan dastan cirayê ye
Ü çira...

Agir bû bilbil

Küçik dizüriyan
Wê digot ne xêr e
Qijika belek dixwend,
Wê digot bêyom e.
Bilbil dixwend,
Wê digot şahiya hezar salan e.

Çardeh sal in,
Dilê wê bûye dara li pêş malan
Li ser dilê wê agir bûye bilbil
Ü agir cemedê d'heline
Ü ew dibêje,
Xwedê ka çend salen din bi min de.
JEHAT GIMGIM

Ji beranê ber kêrê re

Te sebir,
wekî porê xwe yê xelek honand
Ü jan wekî aveke cemidi
berda ser cergên xwe
Devlikeni neşemirand,
di berbangêji xwînê qemiri de
Lîçek hêvî kêm nebû
ji çavên te yê behîvî
Her çiqas evîn di dil de sor dibû
wekî sêveke Meletiyê
Bi leza siwarê bedewiyan
tu dibezi ber bi yara bedew.
Gurêñ har û pirebokan
siya te perçiqandin

Nêviyêñ moxolan
can li ser gurçikên te avêt
Iro tu wekî Zapê bi ços î
serê te wekî Agirî bilind
Gurpegurpa dilê te
Ji haveynê mirovahiyê dimeye.
Tu iro wekî berxikekî beguneh
Weki bazekî azad î.

HESEN ZINAR

Roza

Quwetê variti mi ano
Boya herri beno
Lûlê tifingan, benê Roza
Ti hinzar varita wesarı
Ti rojeki di çeher demser
Mitikê koyan di kozikêki
Lûlî di fişekêki

Ü talazokan di quwetêdo limita
Çimê to, porê to, hela porê to
Awirê to dijmin qarnaynê
Erê; Roza militanêki bî
Ga kora bizanaynê rindbiyayîs ra
Ga dijmin har bo
Ü bi topê da hawanî, ya kî kinda
dijminî merez a

Bihameynê pirodayîs
Semedê to nûsena Roza
Çimê to, hêrs û zera to nûsena
Ü rojekî di ti senî çeher demserî jiyaya.
Bira wî verbikuwi yo asmên, xwi
verbikuwi yo roj

Bira xwî verbikuwi yo insaneyet
Darê viye verdi ameyey,
vilikê fişkoyêni
Bira tersonekî xwî verbikuwi yê
Ü Roza rana kozik di bî

Bi çimandê hiwatenî şane kerd

porê xwi
Bi giştandê xwi né virdiyekan
Bi hiwayîşê xwi no qijikey şane kerd
Şinasnayışêdo hîrê deqey bí to rey di
Erciyaynê bi tarîxêdo se serre
Hêrsê to çığa bi hêrsdê mi mendêne
Deyrê má yek fek ra
Senî awîri daynê
Ü bi pirodayîs nabzan rey di hawar a
maya ki
Yewbîni hemêz kerdê, senî yeno
vîrîkerdiş

Mi goştari Roza
To senî cilê veylekêni ko ana daynê
Go sinorî nîşenibê to esîr bigî yê
Go kozikî bibê warê rindey
Dinya zana
Mi bei destandê xwi ti limita Roza
Bi destandê xwi né bêba erey,
bi kelegirî
Wirdiyê nano ki gonî miyon kewtbî
Tonika elegendê to yê çepî di bi
Parsûyandê to yê çepî di bi
Parçê şarapnalî, yê namerd
'Erdo derg kerda feknûr, bêrîh
To bi leşa xwi hemêz kerd zera mi
Zera to ya kî to pêt hemêz kerdî
Ü viyedê to di gerdanê to yo sond
werde

Sirrê ya ci bi, Roza
Çimê jinê bar nêbî ma mirdî bijîyê
Hiwayîşî leşanê bêrihan xwi vîrî
biyari.

Xwi leqnayîş û hereketê de guşan
Semedo ki to hemêz bikê çimê jîni
Senî rayîd dê.
Çirê ay çend lezî Roza, çirê?
Halbûkî to sebrê xwi bi dîdanandê xwi
Koyan di kend bî,
Ewta şewi zaf serd û bi hêrsî.
Vayê gonî lerznenô leşa mi
Ez bi weziyetê xwi no şasbiyaye,
betiliyaye
Ü perîşan qîraya.

Leşa to bermaynê bi çimandê to rey di
Roza
Leşa to bermaynê.
Homayan ra hesreta Venusa rindî
Kleopatra ardî ma rî Roza.
Ti indî çend rinda, ki şewatêda bêpeynî
Hesreta to geliyêdo bêbin
Mi bi destandê xwi ti limita Roza
Bi destandê xwi né bêba erey,
bi kelegirî

TADAYOX: MIHEM HIMBÊLİJ

Hebûna welatê gerîla

We li kîjan çiyayê bilind
Xortekî jîr û çeleng
Di çavê wî de hezkirina welat
Di kenê wî de baweriya azadiyê
Li sûretê wî xalêñ dîrokê dît
Ew ez im

Ji nû ve şin bûme mîna belaziz
Li Cûdî wek nêrgiz
Li Gabar wek bilbzîk

We dît li banga sibê
Li hêla Rojhîlat
We dît ku tîrêjîn tavê dibiriqin
Şewq û tîn didin
ku nagihîne pêlêñ ewran mij û dûman

li ku ronahî heye, ez li wir im
Her diçim pir dibim wek gula belgîn
li Cîlo mîna binevsâ rengîn

Li ku zincîrên qetiyayî
qeydîn şikênanî
kolêyîn azadbûyî hebin
Li ku mirov bêtirs biaxivin
Pîrek serbest bijîn,
Ku we zarok di destê wan de kevir
Li pey panzeran dîtin
bila ez bêm bîra we

Li her derê me, difirim mîna baz
Diparêzim gülê nûbişkivî
Beybûn, rihan û gelê aştîxwaz

Dema kê dît li nav gel
Cîranêñ egît û leheng
Pêçayî bi çek û rext
Bi bombe û tiving,
We li ku şervan dîtin
Mîna gula bergîn
Canfeda û xwînşîrîn ew jî ez im

Dema welat rizgar bû
Gel serfiraz û azad bû
We dît kî li pêş e
Ala sor dikêse
Ew jî ez im
Lewra ez gerîla me

HARBÎ SOYLU



Vê hefteyê li navendên çandê
Li NC'M'ya Stenbolê:
 ● 10.11.1996 Yekşem: Konsera: Koma Agirê Jîyan, saet: 13.00
Drama televizyonê: "Mizgîn", saet 15.00: Teatra Jiyana Nû : Zeviye Jîyanê, saet: 17.00
 ● 13.11.1996 Çarşem: Semîner: Fikret Başkaya, "Wateya Pergala Nû ya Cihanê û Globalîzm", saet: 18.30
 ● 15.11.1996 Ìn: Film: Ben Rocco Papleo & Chaplin Keaton, saet: 18.30
 ● 16.11.1996 Şemî: Konsera Koma Rojhîlat, ji bo bîranîna Seid Riza,

saet:13.00: Nimûneyên xwarinên ji mitbexa kurdî
Teatra Jiyana Nû: "Daweya Generalê Teneke", saet : 17.00
Li Evrensel Kültür Merkezi:
 ● 10.11.96 Yekşem: Panel: Alaattin Bilgi, "Tesîra Şoreşa Octobrê ya ku li ser Tırkiyeyê bûye", saet:15.00
 ● 11.11. 1996 Düşem: Film: "Salen Mor", S. Spilberg, saet: 15.00
 ● 14.11.1996 Pencsem: Film: "Roma Roma", F. Fellini, saet: 15.00-18.00
 ● 16.11.1996 Şemî: Panel: "Di muzikê de bingehbûn û bi bazarê re têkîf. saet: 15.00

RÛDAN

Li Başûrê Biçûk

Mîhrecana helbesta kurdî

Roja 25'ê kewçêra 1996'an saet li deh û nîvê sibêhê li bajarê Helebê Mîhrecana Çaraî a Helbesta Kurdî, li Başûrê Biçûk dest pê kir; bi kîliyek bêdengî li ser gîyanên şehîdên tevgera kurdî û gîyanê Cegerxwîn.

Mîhrecan her sal di bîranîna çûyîna helbestvanê mezîn de li dar dikeve. Dilawerê Zengî û Ferhadê Çelebî yeko yeko helbest pêşkêş kirin ji guhdaran re. Hejmara guhdaran li dora pêncî keşî bû, hejmara helbestvanan jî digihîst bîst û duduyan.

Evindarê Xemgîn (Jina kurd), Mêhemed Hemo (Hevala min), Şêrgelê Kurd (Welat li hêviya we ye sipas), Îbo (çend helbesten serbest xwendin), Mêhemed Şêxo (Mistek gez ji tariyê), Rûxweşê Zîvar (Dermanê mirinê, Mümîmî welat, şer û şûr, Şêrewî bi Yarê, Pêlênderiya pêdorî), Rêberê Kobanê (Welat), Silêman Azar (Şah bû), Kamîran Bêkes (Heyva birîndar), Bavê Selah (Ey malî ava), Çarnasê nenas (Tengezîrim), Şêrgo Bedirxan (helbesten serbest), Arşevî Oskan (wêneyate, bang, birakuji), Diya Ciwan (Temîn, Ji bo Leyla Zana, Ez sername, Digotin), Bavê azad (Welatê parçekirî, birakuji), Ridwan (Qêrîn), Bavê Ciwan (Erê erê), Wehî (Şikestinek dirêj), Ebdurrehman Hesen (Pismam û şivan) û Ferhadê Çelebî çend helbesten :we pêşkêş kirin û rê dabû keçeye dehsalî (Şînav) ku bi çend stranê germ besdar bû.

Heleb û Efrîn û Kobanê û bi hêviya ku mîhrecan hêjatir û serketifir be, nameyên ku hatibûn mîhrecanê hatin xwendin ji kovar û rojnameyan:

Zanîn, Gulistan, El Hiwar, Rewşen-bîrê pêşverû (bi erebî), Xunav, Pirs, Buhar, Newroz, Azadiya Welat.

Li gel nameyên helbestvan Tengezîrim Marînî, Can Kurd, Dr. Hisîn Hebeş ji Almanyayê û nameya malbata Cegerxwîn ji Swêdê.

Cend nimûne ji helbesten ku hatin



xwendin:

SEYANA DIL

Dil bi riya Seyranê

Ket

Li kîviya çavên dîlberê

Konê xwe vegirt

Bi hêsrêv evînê

Destnimêja xwe girt

Çavên dîlberê kir

Qulbename

Qulbe xwe nişan kir

Li ser nimêje

Navê xuda ji bîr kir

Mihemed Hemo

SERNAME

Mala me di sînga gund de ye

Gundê me

Di sînga çiyê de ye

Çiya

Di sînga Kurdistanê de ye

Kurdistan

Di sînga min de ye

Diya Ciwan

Piraniya helbesten ku di mîhrecanê de hatin xwendin ji hêlî babetê ve li ser birakuji û rewşa welat a reş û kambax bûn.

HELÎM YÜSIF

TÎŞK

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Hosteyê min Azîzê Suryanî

Di dîroka Kurdistanê de; bajarê Amed, Farqîn û Hesenkeyfê cihekî girîng digirtin. İro mijokdarên tîrkan, ji bajarê Amed re dibêjin; Diyarbekir (!). Gelo ew nav ji bo ci dane? Bi navê Bekir kesî nas jiyye? Ew Bekirê tîrkan, ne Bekirê Ewan be? Eger ku ne ew be, wekî din tu Bekirî ez nas nakim. Em carekê bibêjin "rast e". Wê wextê "Diyarê Bekir", dibe Diyarêbekir. Ü Diyarbakir, ji vir tê. A din jî; wekî tê zanîn; sererd û binerdê Kurdistanê, tev zîv û zêr, tev maden û petrol e. Dibe ku, ji bo wê yekê ji navê bajarê Amedê kiribin "Diyarbakir". Yanê, cihê ku paxir jê derdikeye. Lakîn, dîsa jî, di dilê kurdan de; bajarê Amid, Amed, serbajar û paytexa Kurdistanê ye. Farqîn, bo ci kirin "Silvan"? Ez hê jî nizanim. Lî belê navê Hesenkeyf hê jî wekî berê Hesenkeyf e.

Hesenkeyf-pêşî kirin nehiya Mêrdînê. İro jî bû qeza Batmanê. Ü iro, dixwazin ku, Hesenkeyf di bin avê de bihêlin. Bifetisînin, wê winda bikin. Li Hesenkeyfê du minare hene. Çirokên wan pir dirêj û dilşewat e. Li gorî tê riwayetkirin; wexta ku hoste minareyê çedike, di navbera wî û şagirtê wî de, nîqaş çedibe. Şagirt, idia dike ku "Ewê ji hosteyê xwe çêtir minareyê çêbike. Hoste, hêrs dibe. Rûspî dikevin navbera wan û qewlê xwe datînin. Zemanê xwe tesbît dîkin. Şagirt û hosta, cuda cuda dixebeitin. Her yek bi serê xwe wê minareyekê çêbike. Rûspî wê qerarê bidin.

Roja wan û qerarê tê. Rûspî pêşî diçin li minareya hoste dinêrin, digerin yek bi yek. Paşê bi hev re diçin minareya şagirt. Rûspî li wê jî dinêrin, digerin. Hoste û şagirt, li serê minareyê, di navâ serafê de, dîsa nîqaş dîkin. Hoste dîn û har dibe. Destê xwe radike ku li şagirtê xwe bixe. Lî belê, şagirt direve. Hoste dikev pey, ku wî bigire, wê wî jî minareyê bavêye xwarê. Çavên hosta sor bûne ji hêrsan. Carekê hoste dinêre ku şagirt tune. Dibêjê "gelo ew firiya?..". Hoste rê girtiye. Carekê dinêre ku ci bibîne? Şagirt, ji mêv ve dakteviye jér. Destê xwe dibe ber bêhvila xwe û henekên xwe bi hosteyê xwe dike. Meger ku, şagirt; minareya xwe du rîyî ava kiriye. Yek ji bo çûyînê. Yek ji bo dakinîn. Hoste, bi wê hêrsa xwe ji serê minareyê xwe diavêje jér.

İro jî her du minare li hemberî hev in. Mîna hoste û şagirtê wî. mirovîn ku li van minareyan digerin, bi piranî wê çiroka, hoste û şagirt nizanîn. Mixabin, li welatê min, pir cihêن xweş hene. Çirokên wan dijwar in.

Ciranên me yên nêzîk suryanî ne. Suryanî/asûrî; zarokên împaratoriya asûriyan in. Medan, împaratoriya asûriyan felîşandin. Zilm û zordariya Dehak li ser gelên asûriyan jî gelekî hebû, bi wê felîşandin, gelê asûrî jî azad bû. Mirovîn asûri/suryanî, gelekî xebatkar û senatkar in. İro, dînê asûriyan û yên kurdan cuda cuda ye. Asûrî file/xristiyan man. Lî belê em bi hukmê şûr kirin misilman. Ên ku li ber xwe dan; derketin çiyan, êzidî man. Her çiqas dîn û baweriyen asûrî û kurdan ne wek hev be jî; tu carî dijîti di nava wan de nebûye.

Bavê min, her car digot: "Gelê asûrî, mirovîn suryanî gelek paqîj, durist û hêjâne. Xwedî ol, bi bext û di pîşeyen xwe de xurt in." Ji bo wê yekê jî ez dam ba hosteyê radyoyan Aziz Kılıç, (Azizê Suryanî), birayê min û mezin jî, da ba hosteyê diranan, Mirze û Şemûn. Hosteyê min, wekî bavê min bû. Tu carî né min ew, ne jî wî ez ji bîr kirim. Bi salan em li hev du geriyan. Mixabin, tu carî me hev du nedît. İro, min ji hevalekî xwe yî hêjâ bihîst ku hosteyê min; Azizê Suryanî çûye rehmetê. Dilê wî ji nişka ve sekiniye. Berî ku canê xwe teslîm bike silavên xwe ji min re bi rî kirine.

Ez pir bi ber ketim. Dilê min bisikuvî. Min got; Silavê te ser ser û her du çavên min hosteyê delal. Ez tu carî te ji bîr nakim! Tuyê tim di dilê min de bijî.

Diziyə baxçe

Xwediyê baxçe dibîne ku sê kes ketine baxçeyê wî, fêkiyan didizin. Ji van dizan yek fileh, yek êzidî û yê din jî misilman e. Ew dixwaze bi konevanî zora wan bibe. Ji xwe re wiha dibêje: "Ezê hinekan bidime pişta xwe, yekî jî bidime hemberî xwe. Bi vî awayî yeko yeko wan bikujim."

baxçeyê mirovî misilman hebûye, di vî baxçeyî de gelekî tiştîn xweş hebûn. Ev mirov ji bo ku zêdetir berhem ji vî baxçeyê xwe bigire û jiyana xwe pê derbas bike gelekî ked daye. Ji ber ku gelekî ked daye, baxçeyê wî gelek fêkî girtibûn.

Rojekê xwediyê baxçe diçe nav baxçeyê xwe. Ji bo ku ji mala xwe re fêkî bîne. Lî dinêre ku sê mirovên diz, ji bexçeyê wî fêkî didizin. Xwediyê baxçe wexta vê rewşê dibîne şas dibe. Dizane ku bi tenê nikare bi van her sê mirovên diz. Diseki-ne û difikire. Ji xwe re dibêje: Ez çawa bikim ku ez karibim tola xwe ji van dizan bistinim. Lî belê ez van dizan jî baş nas dikim. Ji van dizan yek jê fileh e, yek jê êzidî ye û yê din jî misilman e." Ev rewşa hanê ji bo tolhildanê karê xwediyê baxçe gelekî hêsan dike. Ji ber vê yekê dibêje ez konevaniyeke zexm bidim meşandin. Qene ez karibim tola xwe ji van bistinim.

Ji xwe re wiha dibêje: "Ezê hinekan bidime pişta xwe, yekî jî bidime hemberî xwe. Ancax ezê karibim bi vî awayî yeko-yeko wan bikujim."

Pêşî gazî mirovê misilman û yê fileh dike û ji wan re dibêje: "Binêrin ez misilman, tu misilman û tu jî fileh i. Em her sê jî xwediyê dîn û pirtûk in. Ez dixwazim hûn daxwaziya min qebûl bikin. Em her sê jî bibin yek û mirovên êzidî yê bêdîn û bêpirtûk ji nav xwe rakin." Dema wiha dibêje, ew mirovên fileh û misilman daxwaza wî qebûl dikin û dibin yek yê êzidî di-kujin. Xwediyê baxçe, bi mirovên misilman û yê fileh re bi vî awayî digihîje armanca xwe. Dema ku yê êzidî jî nav xwe radikin, îcar dor tê ser ê fileh.

Xwediyê baxçe ji yê misilman re dibêje: "Gelo em herdu jî ne misilman in, dînê me jî yek e, pêxemberê me jî yek e û pirtûka me jî yek e. Em herdu jî birayen



hev in. Ma ci karê evê fileh di nav me de heye. Ew fileh, em misilman. Divê em herdu jî bibin yek û yê fileh bikujin. Heger tu aîkariya min bikî, ezê malê xwe li te helal bikim."

Dema wiha dibêje mirovê misilman ji daxwaza wî qebûl dike. Bi vî awayî herdu jî dibin yek û dikevin ser yê fileh, heyanî ku rih ji canê wî dikiş.

Bi vî hawî mirovê misilman yê xwedî-

yê baxçe digihîje armanca xwe. Ëdi bi tenê jî dikare bi mirovê misilman ku, diziya wî kiribû.

Dizivire ser yê misilman û jê re dibêje: "Gelo ma te qey fehêt nekir tu bi van herdu bêdîn û bê imanan re ketî baxçeyê min? Îcar dora te ye. Xwediyê bexçe dikeve ser û wek ên din wî jî dikuje."

HASAN HARAN
MEHMET KORHAN

Hinek çûcîkên civîkan
Bête wan têjîkên pişikan
Ew çûne serê dikan
Dikan li wan dixist bi dendikan
Ew direvin bi çarlepikan
Hem direviyan
Hem digotin çêkerên memecîkan.

Ew jî bûn wekî Eli Newerek
Eli hebû newerek
Gelek zeif, tîrsonek
Ji Elo re anîn jinek
Elo birin oda wî
Mîşkek ket nav rîha wî

Serê perbêpiş

Elo ji tirsa mişki
Revî ket li ser piştê
Ji bêhemdiya wî
Mêşek ket bin lingê wî
Elo da xwe meth û nav
Ji xwêdanê temam bûbû av
Got: "Jinik ez kilê çavê te me
Min şer çawa xist term e
Ew şerê perbêpiş
Min çawa kanî ew kuşt

Ew çûn çiyayê axirîn

Dikan li wan xist qîrîn
Ew ji palan tev revîn
Ew direvin wekî teyr
Dikan li wan dikir seyr.
Ew teyrêne we kurdan
Ew nikanin bi dikan
Lê diçin ser ehlê gundan
Gelek tund û bê dîn in
Di nav gundan de
Hespêne xwe rind dibezinin
Wexta dertiêne çiyan
Dibine wekî miyan.

MIHEMEDÊ DEKSÜRÎ

Dûpişk û beq

dûpişk ji beqê re dibêje:
-Min ji çem derbasî hêla din bike. Beq dibêje:
-Baweriya min bi te tune, tu dê bi min vedî. Dûpişk dibêje:
-Ez te vedim tuyê bimîri. Wê demê ezê jî bixiniqim. Ev gotin dikeve serê beqê, daxwaza wî dipejirîne. Dûpişk li pişta beq siwar dibe û dikevin nava avê. Di nîvê rê de şewatek ji paş stûyê beqê tê. Beq fêm dike. Ji dûpişk re dibêje:

-Ma tu jî dê bimîri, te çîma bi min veda? Dûpişk dibêje:

-Ez bizanîm ku ezê bimîrim jî, ez dîsa bi mirovan vedidim. Tebieta min ev e. Divê ez bi mirovan vedim.

Rewşa dûpişk, dewleta tîrk tîne bîra mirov. Di gel evqas hewlîn aştîyê ew hîn şer tercîh dike, rayedarê dewletê ji bo şer dikarin welatê xwe jî bifiroşin. Di dîrokê de bi qasî şah û padışahan, wezîr û sedrezam jî xwedî roleke mezin bûne. Hin car bi fêl û dafan padışah xistine bin bandora xwe. Ew xapandine, ji xwe re cih çêkirine.

Îro Tirkîye û dewletê împeryalist wekî sedrezam û padışahan in. Lî di dîrokê de jî, îro jî ya ku bi ser ketiye desthilatdarî ye; dewletê împeryalist ên xwînrej in. Lî belê mafîn xwe diparêzim. Hemû politikayê xwe li gorî pêwistiyen sermayeyê çedikin.

Brîtanya ji çend bombe yê û İrlandaniyan xof digire, pê re li dan û standinê dike. Bi sistem rî ve diçin. Tirkîye bûye xerabeyek. Hawîrdor dirize. Gel di halê serdema navîn de ye. Ji avakirina xwe ta îro dewleta tîrk bi fêl û dekan li ser piyan maye. Di bazara dînyayê de xwe rînd firotiye.

Li stûyê Yekîtiya Sovyetan siwar bûye, li stûyê NATO'ye siwar bûye. Van demê dawî bêhtir li Almanyayê siwar dibe. Lî negîhiştiye mebestê xwe. Deh sal e şer dike. Gelê kurd jî sedî nod di vî şerî de zirar dît. Lî daxwazên xwe jî di hilbijartina dawî de got. Bi kurtî dewlet dizane ku hêdî hêdî dimire, lê dîsa jî dibêje: "Şer û şer", dibe ku dewlet dûpişk be, lê em ne beq in...

MENDO MOBAR

Kultur, Huner û Edebiyat


**Her çiqas em bibêjin ev pirtûkeke nû ye jî,
nivîsên ku tê de cih girtine tev ên
weşandî ne; yanê nivîsên cur bi cur ên
Firat Cewerî ku di rojname û kovaran
de hatine weşandin.**

Bi navê "Kultur, Huner û Edebiyat" pirtûkeke nû ji nav Weşanê Nûdemê derket. Ev pirtûk ji aliye Firat Cewerî ve hatiye amadekirin. Firat Cewerî beriya vê berhema xwe tevî du pirtûkên çirokan çend pirtûkên biyan jî wergerandibû li zimanê kurdî û tê zanîn ku Cewerî Xwedî û Berpirsê Kovara Nûdemê ye, ya ku li Stockholmê derdikeye.

Her çiqas em bibêjin ev pirtûkeke nû ye jî, nivîsên ku tê de cih girtine tev ên weşandî ne; yanê nivîsên cur bi cur ên Firat Cewerî ku di rojname û kovaran de hatine weşandin. Ü her çiqas ji pêşgotina vê pirtûkê were fêmkirin ku hevpeyvînê Firat Cewerî ligel nivîskarê kurd in, lê em dibînin ku ji xeynî hevpeyvînan gelek cure-nivîsên din tê de cih girtine. Ev hevpeyvîn û nivîs tev di rojname û kovaren mîna Nûdem, Kurdistan Press, Karlstad, Welat û Yeni Polîtika'yê de hatine weşandin.

Xwendevan her hal wê bizanibin ku xebateke bi vî cureyî di nav kurdan de ne destpêk e. Beriya Firat Cewerî, hin nivîskarê din jî eynî bi vî rengî, nivîsên xwe yên ku di rojname û kovaran de dane weşandin, anîbûn ba hev û kîribûn mîna pirtûk. Wisa dixuye ku xebateke bi vî rengî ne ya dawî ye jî. Lewre ji bo kurdan ji bo nivîsandinê êdî mijarê nû neman, ji ber wê jî nivîskar dest avêtine nivîsên xwe yên weşandi!..

Tîstekî gelek enteresan bala min kişand. Cewerî bixwe di pêşgotina vê pirtûkê de diyar dike ku: "Hê di destpêka salen 80'ê de min dixwest ez bi nivîskarê kurd re bipeyivim û hevpeyvînê bi wan re mîna pirtûkê çap bikim. Min di destpêka 1984'an de ji Qanatê Kurdo re nameyek nivîsand û pêşniyaza amadekirina pirtûkeke wilo jê re bir. Wî pêşniyaza min maqûl dît û bi xebateke wilo kîfxweşîya xwe anî zi-



man. Lî ji ber zehmetiya şerdên Sovyetê, min îmkana peyvandina bî wî re nedît, pişti demekê wî wefat kir. (...)

Min hingî pêşniyaza xwe ji Cegerxwîn re jî biribû, wî jî pêşniyaza min di cih de de dîtibû. Hema di wê navê de Cegerxwîn jî wefat kir. (...) Min pêşniyaza xwe bi nivîskî ji Nûredîn Zaza re şand Swîsreyê. Pişti kurtedemekê bersiva wî hat û pêşniyaza min bi kîfxweşî qebûl kiribû. Lî hê berî ku ez bigihîjim pîrsên xwe amade bikim, wî jî ji nava me koç kir.

Ji ber tîrsa ku wê Rewşen Bedir-Xan û Osman Sebrî jî ji nav me koç bikin, min hebekî lez da xwe û ji bo dîtina wan ez di sala 1987'an de çûme Sûriyê. Min Rewşen Bedir-Xan li Baniasê û Osman Sebrî jî li Şamê dît. (...), seredana duwemîn ji min re nebû qismet, ew jî li dû hev çûn."

Gelo ev tîrs û xof kete dilê we jî ku Firat Cewerî bixwaze xwe bigihîne kê an jî xwe carekê digihîne kê, ew ji.nav me koç dibe?!

NUR-HAYAT

Vê binivîse lawo!

JAN DOST



Bavê min tu carî nêzîkî nivîsandînên min nebûye û hîç tiştîn ku ez dinivîsim naxwîne, tenê ji bo Mem û Zînê û şîrokekirina wê kêfa xwe dianî û digot: "Wê xelk bixwîne."

Vê dawiyê ew ketiye halekî xerab ji nexweşiyê, ji bêhêzî êdî hew dikare nimêj bike, şevekê ez li ba wî rûniştibûm û min ber dilê wî dida û digot: "Înşelleh tuyê rehet bibî!" Hema min dît ji nişkê ve berda gîrî, giriye kî wisa tehl û bi şewat kir û gîrîye min jî anî, bi rastî heta niha min gîrîye wî

nedîtibû (min kenê wî jî nedîtiye), di nav gîrîye xwe re hêşirêne xwe damaland û got: "Lawo ezê çawa baş bibim, nimêj li min diçe, nimêj!!" Vê binivîse lawo, vê bike tarîx di heyata min de nimêj li min nebûye qeza. Heftê salî min pênc wext nimêj dikir."

Rast e, bavê min bi qasî ku li nimêja xwe miqayit bû, li xwedîkirina zarokên xwe ne miqayit bû, wî bi sedan caran bi şofêrên basêne Kobanî re şer kiriye û di nîvê rî de ew sekînandine, da ku nimêjî di wexta wê de bike.

Bavê min hêşirek tenê ji bo Helebê nebarand, xemgîn nebû ji bo penaberîya milyonan gelê kurd. Ku di bin baran û teyroka bêrehm de bi şev û rojan dimeşîyan, lê ji bo çend rikat nimêj giriye kî tehl û bisewat kir.

Ne tenê bavê mir, bi sedhezaran hene ku wilo difikirin û pîrsên xwe

yên şexsî mezintir dibînin ji pirsa bindestiyê. Ez nabêjim bila dîndarek hay ji dînê xwe tune be, lê di ber dîn û karê rojane de, hinekî bala xwe bide rewşa millet û doza welat jî.

Ji deftera bîranînen min:

Dî sala 1985'an ez nû derbasî Zanîngeha Helebê bûbûm, min di dilê xwe de got: Ez êdî bûme zîlam û rojekê ez û bavê xwe em ketin qirika hev, wî digot: "Ev xelk ci dozê dikin? (Hedefa wî şoreşger bûn) em tev misilman in û birayên hev in!!"

Min xwe ediland û got: "Madem em birayê hev in, çîma me dikujin?! Bavê min hêrs bû û ber bi min de hat, çend şeqamên (sileyê) tûj li rûyê min dan û got: "Eger rojekê kurd bi ser ketin û ez mirî bim, were bi ser tirba min de bi....."

Hîveron

Hîveron, pirtûkek e ku ji 27 helbesten Fêrikê Ûsif pêk hatiye, di sala 1993'yan de li bajarê Stockholmê ji aliye Weşanxaneya Sarayê ve hatiye weşandin.

Helbestvanê hêja Fêrikê Ûsif, yekemîn diwana xwe ya bi navê "Narê", di sala 1977'an de li Erivanê çap kiribû. Li gorî daxuyakirina pêşgotina pirtûkê ku Dawê Xanê nivîsiye, ev diwana Fêrikê Ûsif ya yekemîn "Narê", ji gelek helbesten wî yên şoreşgerî pêk hatiye.

Di Hîveronê de jî, digel hebûna helbesten evînî, disa helbesten welatparêzî û çinayeti li pêş in.

Di vê diwanê de helbesteke wî ya dirêj bi navê "Xwedîhêz" heye ku bi şêweyekî dastanî hatiye hûmandin. Di vê helbesta xwe de Fêrikê Ûsif, pişti heyînê, belengazbûna mirovekî maldar bi zimanekî vekirî tîne zimên.


Hêjâyî gotinê ye ku helbestvanê hêja Fêrikê Ûsif ji wekî Eskerê Boyik, Şekoyê Hesen helbesten xwe bi kurdiyeke şîrîn û li ser şopa Cegerxwîn hûmandine.

HÎVERON



Fêrikê Ûsif

SARA



Fêrikê Ûsif

SARA

Ortak

* Têkiliyê polis ô mapu û eñirên qoriciyan bi qazayê trafikê eñkere bû...

EV LEWHAYEN
TRAFFIKÊ
BIRASTI GELEK
BI MANE
BU!!



Dîrokniyîsê me bi cureyê çîrokî dinivîsin

Destpêk 8-9

Kurdîfî ew e ku gava te pirtûkek dît bi kurdî ye, bala te bikişine. Gava tu bibînî ku ew şîr e, bibêjî ka ew şîr bi kurdî çawa hatiye nivîsandin. Eger ew pirtûka dîrokê be, bibêjî ka ez dîroka xwe nas bikim. A ev e kurdîfî.

Ez li Ewrûpayê gelek geriyame, bawer bike gelek caran dilê min diêşîya, rewşenbîr bûn, siyasi bûn, di mala wan de kitêbxane tune bûn. Xalîce di mala xwe de raxistîne, televizyonâ herî baş anîne avêtîne mala xwe, sarker û heriştîn wan hene, xwarinê bas dixwin, lixwîkirinê wan jî pak in. Lî pirtûkek di mala wan de tune. Kurdîn Iraqê ji pirtûkê hez dikin. Keynî wan jî kêm e.

Problemeke mezin jî heye, ew jî, ji jiyana siyasi tê. Serokê partiyekê kurd ên Sûriyeyê pirtûkeke min çap kiribû. Di meydana çapkînî de gelek xurt bû û karêna baş dikir. Wergerandibû erebî.

Ez li Moskovayê bûm. Hinek xwendevan hebûn li unîversitâyê, min gote wan: "We kitêba min xwend, ka çawa bû, këfa we jê re hat?"

"Wele me nexwendiye"; gotin min. "Çima?", min got, bersiva "Me nekiyî", dan.

Dan xuyakirin ku ji ber ku pirtûk bi destê filan partiyê hatiye çapkîrin, eger bikirin pere diç jê re.

Axir min nivîsandiye, xeynî wî jî, dîroka gelê wî ye. Xwendevan li ser riya rewşenbîrîye ne. Gere em li ser vân tiştan jî bisekinin.

Ziyana gotina "her tişt ê me ye, me ew afi-randine" ci ye?

● Ev xusûsiyeta demê ye, dem bi wan dide gotin. Li meydânê pirs heye, bersiv tune. Vê çaxê bersiva hêsa (hêsan) ew e wekî her tişt ê me be. Tiştê ku di dîrokê de eyan e û kifş e ne em in, wê jî hiltîne. Ev di nava zanyariyê de dema zaroktiyê ye.

Eger em ji aliyê zanyariyê ve lê binihêrin feydeya wê tune. Eger tu wekî zikê birçî têr bîkî, feydeya wê heye.

Hemin we behsa partiyêni siyasi kir, em jî vê pirsê ji we bikin. Hün bi ci çavî li têkiliyê navber rewşenbîr û partiyêni siyasi dinihêrin?

● Partîf wek organizasyonê siyasi xizmeta xwe dikin, ji bona miletan, ne tenê ji bona kurdan. Xizmeta wan ji bona azadiya gel e. Dê-

mek azadiya kultura gel e. Ew xizmeta kultûre dikin. Gava tu xizmet dikî, qîmetâ rewşenbîran gerek e bizanibî ku ew çawa xizmetkarêne kultura gel in. Nê ku tu bînî wan bikî koleyên xwe. Gerek e tu alî wan bikî ku ew zêde xizmetê bikin, di meydana xwe-de.

Rewşenbîr tu caran heqê wî tune ji doza gelê xwe, ji eş û jiyana gelê xwe dûr bikeve, bê-hay be û bibeje ez rewşenbîr wî mileti me. Ez kîmanîyê ji ji rewşenbîr rî dibînim eger xwe bi organîzasyonekê ve, bi partiyekê ve girê bide. Ü wekî rewşenbîr wê partiyê, organîzasyonê bê naskirin.

Cîmkî gava her yek xwe bi cihekî ve girê bide wê çaxê ji hev cuda dibin. Rewşenbîr warekî serbixwe ye, fireh e û aza ye. Ew xizmeta duwaroja miletê xwe dike. Eger rewşenbîr ji hev ketin, kultur bi pêş ve naçe. Partî te-

Cemile zarok bû, diçû dersa piyanoyê. Ba-vê min digote gere tu bibî hostayê muzika kur-dan, kompozîsta muzika kurdan. Digotê gere tu bi piyanoyê muzika kurdi çêkî.

Tê bîra min, bavê min fiqe xweş lê dida, wî stranê kurdî lê didan û digot içar vî miqamî li ser piyanoyê derxe. Cemile dikir, çênedibû. Digot: "Bavo dermayê, ewê li ser fiqê ye, li ser piyanoyê dermayê."

Bavê min dixevidî, digotê: "Keçê ev heft qulén vê hene, ev melodî bi vê çêdibe, li ser wê çîma çenabe, nizam çend ewkîn we hene. Ge-re çêbîbe."

Carinan ji bavê min şîrên xwe dianîn û digot: "Ordixan destnîvisara te baş e, rind e. A min ne baş e. Ka ji ber bigire." Pê re jî li ser şîrên xwe pê re xeber dida.

Zînê jî, di warê wergêre de profesyonel e û

**Kurdîlî ew e ku gava te pirtûkek dît bi kurdî ye,
bala te bikişine. Gava tu bibînî ku ew şîr e, bibêjî ka
ew şîr bi kurdî çawa hatiye nivîsandin...
Eger ew pirtûka dîrokê be, bibêjî ka ez dîroka xwe
nas bikim. A ev e kurdîlî.**

ref in, derdorêwan hene.

Meydana kulturiyê hê vala ye, civaka rewşenbîriyê hê di nava me de çenebûye. Ev jî problemeke me ye.

Çi bû sedem ku hûn, xwîsk û bîra tev de di warê çandî û zanîsî de cih bigirin?

● Bavê min bû sedem. Ji zaroktiya xwe ve kurdîtiya xwe parastîye û ji 23 saliya xwe ve xizmeta kultura kurdan kiriye. Serokatiya wê kiriye, berî unîversitâyê ewek heye çar sal dixwînin. Ew ji bona kurdan hatibû çêkirinê, di sala 1931'ê de.

Wî digot: "Şagirtê min ji min mezintir bûn, wê demê."

Ji sê çar kesen ku bingeha kultura kurdên Sovyetê amade kire, yek jê jî bavê min e. Di warê çapkîrinâ pirtûkan de jî keda wî heye. Wê çaxê gelek kes dihatine mala me û diçûn. Gelek rewşenbîr dihatin, axaftin çêdibûn. E, gava tu karê kulturi bikî, nabe ku zarokê te jî nedin ser rîçika te. Lî bavê min bi zanetî em teşwîk dikirin ku em xizmeta kultura miletê xwe bîkin.

çend kitêbên wê jî hene:

Ji neviyên bavê we kesen ku bidine ser vê rîçê wê hebin?

● Bawer dikim wê hebin. Mesela qîza Cemîlê, konservatuar xelas kir. Nika jî doktoraya xwe li ser muzika kurdi dike. Bi riya diya xwe diçe.

Zarokên min biçuk in. Qîza min hê biçuk e. Dibêje: Bavo ezê li ser edebiyata kurdi bixwînin. Edebiyata kurdi bi zimanê almanî bidime xuyakirin.

Kurê Ordîxan, bi erebî baş dizanibû, li ser kurdan mijûl dîbû. Wefat kir.

Em ne wekî bavê xwe ne. Cîmkî ew bavê çar zarokan bû. Ez bavê du zarokan im, bavê keç û kurekî.

Ew qonaxa ku di dema bavê we de dest pê kiribû iro jî didome?

● Na, ew jiyan nema. Ew rewşenbîr gişt belav bûn. Wê çaxê, maf û zimanê miletêni biçuk dihate parastin. Miletê ermen jî ji me re dilovan bû û dost bû. Piştevanî hebû.

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan İşık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMÎ TAN
RAHMÎ BATUR

Berpîrsê Karê
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessesesi Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat

Suriye: Jan Dost
Helim Yusiv
963-21-960099
Berlin:
Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçük
49-5721-81360
Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Brukssel:
Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Gîhê me li ba ked, demokrasî û azadiyê ye

Li Ruhayê şes radyo û du tv hene. Ji wan radyoyan "Radyo Medya" ku nêzîkî derdora "Med-Zehra" û kovara Nûbiharê ye carinan İlahiyyen bi kurdî diweşîne. Lê radyoyên din gişt di terza arabesk de ne. Bê mubalaxa li derdora Ruhayê ji sedî 70 li "Radyo Karacadağ" tê guhdarî kirin..

Birêz M. Can Toprak, der barê politikaya weşana radyoya xwe de, hûn dikarin agahî bidine me?

- Xêza weşana me dijber ango muxalif e. Gelo muxalisbüna me bi ci awayî ye, divê pêşî em vê sererast bikin. Îro li vi welati kesen karker, gundî û belengaz gelek tê perçiqandin, maf û keda wan tê desteserkirin. Muxalisbüna me ji di vê derê de xwe dide eşkerekirin. Em her gav xwe nêzîkî van tebeqeyen bindest dibînin. Em cihê xwe li ba nirxen weki demokrasî, ked; mafen mirovan û azadiyê dibînin. Li hêla din em xwe li hemberî rejîma ku niha li rastê ye, dibînin. Em van dîtin û ramanan di bermaneyen xwe de bi awayekî zelal diyar dikan...

Sedema avakirina bingehîn a Karacadağ Radyoyê, hûn dikarin ji me re diyar bikin?

Sedema avakirina radyoya me, bi tevahî alternatif medyaya derewîn e ku gelek caran jê re dibêjin 'renkli basîn' (çapemeniya rengîn) ji.. Îro ji bilî çend rojname û kovaran, piraniya çapemeniyê borezaniya rejîma faşist û kedxwaran dike, dibe dengê bazirganiya ser û neyarê aştiyê. Dema van yekan dike ji rastiyen ji gelê tirk û kurd vedişere. Bûyer û qewimînen ne bi dilê wan mîna sê meymûnan; nabînin, nabêjin û nabihîzin, li hemberî vê medyaya qirêj me got li Ruhayê emê dengekê muxalif derînin holê ...

Dijwariyên li ber weşanên radyoyên dijber ci ne?

- Li cografaya ku em lê dijîn dev ji weşankariyê berdin, eşkerekirina nasnameyê ji, bi serê xwe astengiyek e. Li welitekî ku xwe eşkerekirin qedexe be, aşti qedexe be, mafen mirovan qedexe bin ji ber ku hûn rojnamevaniyê dikan, werin vi hesabî ji hûn bikin.

Îro em ji aliyê weşanê ve, ji avantajen ku metropolên mîna Stenbole, İzmir, Edene û Mêrsin jê istifade dikan bêpar in. Mesela ji me re gelek zor tê ku em şexsiyeten navdar ji bo bermaneyan bînîn studyoyê, lê em bi riya telefonê vê yekê dikan. Heta vê gavê gelek şexsiyeten mîna Feqî Huseyin Sağıncı, Nuray Şen, Koma Agirê Jîyan, Grup Kızılırmak, Gurup Yorum, Hozan Ahmet Telli, Yılmaz Odabaşı, Aydin Alp, Ragip Duran, Er-



tugrul Kürkü, Cezmi Ersöz û hwd. bi riya telefonê bûne mêvan. Eger şexsiyeten wiha li studyoyen xwe bikin mêvan wê qiyamet rabe, wê polis studyoyê dagir bikin, ji xebatkaran bigire, heta mîvanan wê gişkan bixin binçav.

Di bermaneyen muzikê de navbera we û zimanê kurdi çawa ye?

- Muzikên me ji sedî 10-15 bi kurdi ne, mixabin dema em vê yekê dibêjin em ji xwe şerm dikan. Li welitekî, urmamî wî yê zîmkî ji sedî 90 qedeti. Kombî yê qiyaseke bi vi rengî li yekîne dace, e disa ji pişti zimanê tirkî zimanê kurdi di reza xwe ya duyeşmîn de cihê xwe girtiye. Ji ber ramana xwe ya "biratiya gelan" em bi 23 zimanen muzikê didin weşandin. Ev ji bi cerkezi, çeçenî, erezî, gilizi, fransizi, almanî, yownanî, ermenevi û ibranîkî û hwd.

Cara dawî RTÜK (Lijneya Bilind a Radyo û TV'ye) 7 roj cezayê girtinê li we bîr. Cezayen bi vi awayî wê di pêşeroje de re li ber we bigirin gelo?

- Weki ku tê zanîn RTÜK ji generalên teqawîlit, bürokrat û nûneren partiyen siyasî pêk tê. De werin bisikirin, saziyeke ku ji faşistan pêk were, wê bi ci awayî biryareñ beâli û demokrat bistîne. Li hêrêma şer nûneren RTÜK'ê hêzîn e, yetê ne. Emniyet stranan li gorî xwe û nîrxîne, werdigerine! Werger ji sedî 70 berevajî ye. Hin dûv-mûvan pê ve dike û dişine RTÜK'ê.



Di navbera 23-29'ê kewçêrê de me 7 roj cezayê girtinê stand. Li dijî van biryar û kirinan emê tu car gavên xwe bi paş ve neavêjin, cezayê bêheq û bêhiqûq ku dane me şewqa me ya xebatê naşikîne, berevajî cezayen bi vi awayî me bêhtir bi hêrs û bi azîm dikan.

Girtina me ya 7 rojan ji bi vi awayî bû. Strana "Haynikna" ku ji hêla Koma Amed ve di kaseta Kızılırmakê de tê strandin, li gorî wergera Emniyeta Ruhayê, RTÜK biryar da ku di vê stranê de mustehcenî (bêehlaqî) heye. Pişti re strana Hoza Şemdin "Şer e Şer e" disa bi awayekî ne rast dane wergerandin, wê gavê ji RTÜK'ê sûcê "Haynikna" û "Şer e Şer e" bi hev re girê dän û "Li gorî madaya 3985 benda "a" hewldanen parçekîna velat û xerakirina ehlaqa malbatîye" e hatin ta hanbarkirm.

Bî vi awayî di navbera 23-29 kewçêrê de me 7 roj cezayê girtinê stand. Li dijî van biryar û kirinan emê tu car gavên xwe bi paş ve neavêjin, ayî, bêheq û bêhiqûq ku dane me şewqa me ya xebatê naşikîne, berevajî cezayen bi vi awayî me bêhtir bi hêrs û bi azîm dikan.

Pişti pêvajoyê, roja girtinê 50 polisen ji anti-terorê û ji maseya çapemeniyê avetiñ ser studyoyen me û biryar teblîx kirin. Roja din me li ser navê radyoyê insiyâfa "Ji bo aştiyê milyonek imze" li Ruhayê hilgirt ser xwe. Wê demê weşana me sekînibû, lê em li Radyoyê bûn. Polis wê gave ji bo vê kampanyaye avet ser radyoyê, 2 mîvan, 2 xwendevan, 5 ji xebatkaran radyoyê xistin binçav û deriyê radyoyê ji mor kirin. Di nav kesen inçavikî de ez ji hebûm. Li wê derê ji maretin ne hate kirin. Her tim digotin "Aştiyê çî, hûn bêdestûr imzeyan berhev dikan". Roja din em derxistin dadgehê û em hatin berdan.

Dest danîn ser du hezar îmze û hezar ji kaxizên vala ku cihê du hezar îmzeyan tê de heye. Pişti van bûyeran li Enqereyê me serî li RTÜK'ê da, me got ev biryaren ku we dane bingeha wan a hiqûqi turine ye, wergerên ku hatine kirin bi qestî û berevajî ne. Me xwest ku ev biryar careke din di ber çavan re were derbaskirin. Gotin "Emê pê re eleqedar bibin". Lê hefta vê gavê me tu encamên erêni negirtin. Ji ber vê yekê ji me li RTÜK'ê doz vekir. Ebûqatêne me ji bo ku ji RTÜK'ê were standin 50 milyon madi 100, milyon manewî, bi giştî 150 milyon TL doza tazminatê vekirin. Ez bi riya Azadiya Welat bangekê li NCİM'ê ji dikim ku ew ji dozê vekin, ji ber ku stranê ku têne texrîfîkirin û berevajîkirin stranê berhemên wan in...

Hûn dikarin Kacadağ Radyo û radyoyen dinên li Ruhayê muqayese bikin?

- Li Ruhayê radyoyeke ku bi terza me weşanê dike tune ye. Şeş radyo û TV'ye bi navê "Güneydoğu TV" û "ŞRT" (Şanlı Urfa Radyo Televizyon) hene. Ji wan radyoyan "Radyo Medya" ku nêzîkî derdora "MED-ZEHRA", û kovara Nûbiharê ye, carinan İlahiyyen bi kurdî diweşîne. Lê radyoyen din gişt di terza arabesk de ne. Em dikarin ji wan re bibêjin "Qutikên muzikê". Hûn reytinga me ji meraq dikan? Bê mubalaxa li derdora Ruhayê ji sedî 70, li "Radyo Karacadağ" tê guhdarî kirin..

HEVPEYVİN: SALIHÊ KEVIRBİRİ